

Serokê Giştî yê PKK'ê Abdullah Öcalan:


**Ez
dixwazim di
warê siyasî
de rola xwe
pêk bînim**

Hevpeyvîna rojnameya
Ö.Politikayê ya bi Serokê
Giştî yê PKK'ê Abdullah
Öcalan re. (R.8-9)

Serokê Giştî yê PKK'ê Abdullah
Öcalan di paketa çareseriyê de
daxwaza otonomiyê kir:

**Kurd bo şer jî bo aştiyê
jî amade ne**

Azadiya WELAT



SAMI TAN

Hem diz e hem topiz e

Çete û faşîst, çavên xwe ji van tiştan re digirin û wekî mirovên ku bi cezbê ketine, bi ayînên hovane alên Îtalyayê û maketên Öcalan dişewitînin. Ev helwesta rayedarên dewleta tirk gotinekeê tîne bîra mirov: Hem diz e, hem topiz e.

Van rojan, dema mirov berê xwe dide medyaya tirk, jê hilmekê pîs difûre. Çêrîroşî û êrîşa li ser gelê kurd gihîştîye radeya herî bilind. Mirov bi vê yekê rewşa kambax a civaka tirk jî dibîne, lewre beramberî dewlemendiya ferhenga tirkînan a çêran, xizaniya ferhenga wan a siyasî jî xwe dide dest.

Qonaxa ku em îro tê re derbas dibin, Serdema Mc Carty a li Dewletên Yekbûyî yê Amerîkayê, tîne bîra mirov. Almanya di dema desthilatdariya Hitler de jî dikare bo şîrovekirina vê serdemê bibe alîkar. Di van deman de rewşa komûnîst û cihûyan çî be, îro jî rewşa kurdên welatparêz ew e. Ne tenê kurd, çî kesê ku doza biratiya gelan dike jî bi çewsandina hêzên dewletê û gurgebozan re rû bi rû ye. Ji tîrsa xwe hin derdorên ku berê dostaniya kurdan dikir, îro silavê jî nadin wan. Ji wan kirî ku, ew dê karibin bi vî awayî xwe ji destê nijadperestan rizgar bikin. Lê çîroka mirovê alman di bîra her kesî de ye: Ew ê ku li hemberî êrîşên ku nazîyan anîne ser kesên ji bîr û baweriyên din bêdeng maye. Dema ku dor hatiye ser wî, kesekî ku wî biparêze

nemaye.

Em piştevaniya kurdan deynin aliyekî, hin rêxistin jî tîrsa gurgebozan çalakiyên xwe jî taloq dikin. Di vî warî de mînak herî berbiçav KESK e. Lijneya Rêveberiya Giştî (GYK) ya vê konfederasyonê biryara taloqkirina çalakiyên xwe da. Tê zanîn ku kedkar bi êrîşên tund re rû bi rû ne. Ew çalakî dê ji wan çalakiyan re bibûna bersiv, lê mixabin ev yek pêk nehat. Em helwesta van kesan deynin aliyekî, werin ser helwesta rayedarên dewletê. Serokwezîrê Tirkîyeyê jî ber têkiliyên bi serekên mafyayê re jî kar tê dîrxistin, wezîr jî ber şewirkariya çeteyan tîne girtin. Heta niha bi hezaran mirov bi destê çeteyan hatine kuştin, lê jî endamên çeteyan kesekî girtî nemaye. Bi tenê Yaşar Öz heye. Ew jî piştî çalakiya xwe ya "welatperwerî" di demeke nêzik de dê serbest were berdan. Serokê Giştî yê PKK'ê Öcalan wekî berpîrsê kuştina 30 hezâr kesî tê tawanbarkirin, lê Waliyê OHAL'ê İdia kiribû ku wan 25 hezar PKK'yî kuştîye. Heke ew hejmar derew be jî, di nav 30 hezar kuştîyan de birek PKK'yî û kurdên welatparêz jî hene. Dîsa tê zanîn ku Serokê

PKK'ê dema di sala 1993'yan agirbesta yekemîn îlan kir, li dora 5 hezar kes di şer de hatibûn kuştin, heke bersiveke erênî bo wê agirbestê bihata dayîn, dê 25 hezar kesên din nehatana kuştin. Li aliyê din Serokê Giştî yê PKK'ê Abdullah Öcalan roja ku gihîşt Romayê da zanîn ku ew jî bo vekirina riya diyalogê çûye wê derê. Lê çete û faşîst, çavên xwe ji van tiştan re digirin û wekî mirovên ku bi cezbê ketine, bi ayînên hovane alên Îtalyayê û maketên Öcalan dişewitînin. Ew helwesta rayedarên dewleta tirk gotinekeê tîne bîra mirov: Hem diz e, hem topiz e. Di tirkî de jî bo vê rewşê "Yavuz hîrsîz ev sahibîni bastırır." tê gotin. Faşîst di van ayînên kevneperestiyê de jî malbatên leşker û polisên ku di şer de hatine kuştin, bi kar tînin. Kes tune ku ji wan re bibêje, bi kuştina Öcalan xwîna ku dirije nasekine, dê zêdetir mirov bîna kuştin û bi ihtîmaleke mezin di nav kesên ku bîna kuştin de, dê zarokên wan jî hebin. Gelê kurd jî aştîyê re amade ye, lê xwespartîne jî bi tu awayî napejirîne û dê heta ku vê rastîyê bi gelê tirk bide fêmkirin li ber xwe bide.

Divê em li hemberî êrîşan çî bikin

Ferhengok

aramî: sebr, hizûr
bêhemd: istemsîz
beşîn: têrdîtî, bi tecrûbe
bemac: kone, qurnaz
bertîl: ruşwet
daneger: bipeyketin
dek û dolab: fen û fût
dilsozî: bağıllık
diyarker: belirleyici
dukar: gotegot (söylenti)
ewlekarî: güvenlik
feraset: tēgihiştin (anlayış)
gerdan: qewirandin
gîlîz: girêz (salya)
helwest: tavır
hestiyarî: hîsî
îspir (mêr): çeleng, qeşeng
jovan: poşman
karîger: faal, etkin
keşe: papaz
kinêzet: sîlsîle
kizwet: kinc, cil
lêbezîn: lêdan, lēxistin
lewre: çunkî, loma

meyav: durgun su
mir: tûjiya ne zêde ya bo xwarinê
nîgargeh: sahne
penaber: mülteci
peng: gilok (yumak)
peywir: wezîfe
rahêl: raser, rajor
raya giştî: kamoyu
rip: ehleqê gerandina kar (alışveriş)
salîs: şellaf (yağcı)
sihirîn: bēxewitî
şane: şahî, şano, konser hwd.
şeyt: tekerlek
şîspir (jin): xweşik, sempatîk
taye: tekerlek
tehn: provakasyon
têkbin: binxistin, bêtesîrkirin
teqez: mutlaka
vehesan: jêfîlîtin, rehetbûn
xêl: govend, dîlan
xêrkirin: bazarkirin
xwepêşandêr: gōsterici
zinîn: pêçandin

ÇETIN MIZAN

Gelê me di pêvajoyeke dijwar re derbas dibe. Êrîşên li ser Serokatîyê û gelê me rûdanên bêeman û nedîtî ne. Em tu car nikarin ji dijmin dilovaniyê bixwazî û dijmin şermezarkirin bikin. Lewre şermezarkirin karê hêzên sêyemîn e. Li şûna şermezarkirinê kar divê, tēkoşîn divê, yekîti divê.

Di van rojên dawîn de ji bilî artêş, çapemenî û saziyên xwe yê din faşîstên xwe jî berî kolanan dane. Li hemberî van êrîşan berî şermezarkirinê divê gelê me çî bike? Divê ev bê pîrsîn.

Divê gelê me li rojên giran û zehmet bifikire. Li gorî vî tivdîrên xwe bigire. Her wiha pêwîst e peywira xwe ya welatparêziyê berî karên xwe yê şexsî û aborî bîne cî. Divê bê zanîn ku dibe ku em beramberî metirsîyên mezin jî bimînin. Jixwe rêxistin û saziyên me kar û barên xwe dimeşînin. Divê gel wan hêzdartir bike. Her wiha li derveyî saziyan jî yekîtiya xwe çêbike û li hemberî êrîşan birêxistinî tevbigere. Divê kurd li taxan, kargehan, dibistanan, li serê rîyan heta li leşkeriyê xwe birêxistin bikin. Ji hev agahdar bin.

Li taxan li hemberî êrîşên kûçikan tevdirên xwe bigirin. Dema ku kesek an jî malbatek bi êrîşekê re rû bi rû ma, divê di heman kêliyê de çî bi riya telefonê çî jî bi riyên din hev agahdar bikin û herin ciyê bûyerê. Her wiha der û dorên xwe kontrol bikin. Dibêjin kurd cesûr in, lê cesaret bi serê xwe têrê nake. Heke deh kes bin jî, mirovên kurd

dewlet li pişt wan e.

Di van rojên dawîn de kuştînen kiryar nediyar dîsa dest pê kirine. Bo nimûne, li Ezexa Şîrnexê Ahmet Oral. Dibe ku dîsa planên 92 û 93'yan tēxin mazetê. Gelê me di vî warî de xwedî tecrûbe ye. Divê li hemberî êrîşên wiha tivdir bîne girtin. Gel li taxan ji hev haydar be. Pêwîst be bi dorê nobedarî bê girtin. Dema ku bûyereke wisa rû da, divê mirov li pey kujer bikevin, wî bigirin û çavtirsandî bikin.

Bila kes nebêje tiştê min nayê. Divê neyê jibîrkirin ku li ba dewletê kurd gişt tawanbar in û wê dora her kesî bê. Gelek kurd bo aboriya xwe difikirin, avahî û kargehan çêdikin. Lê di rewşa şer de

metirsîya ji dest çûna wan heye. Divê kurd li gorî rojên tevkujiyan bifikirin û aboriya xwe li gorî rewşeke wisa saz bikin û li rojên teng bifikirin.

Ger em bêtevdir û rêxistin bin û ji sazî û partiyên xwe dûr bin, dijminê me yeko yeko wînda bike û me ji hev bela wela bike. Serkeftin û azadî nêzik e. Lê bo vî pêwîst e em yekîtiya xwe pêk bînin, xwe bidafînin tēkoşînê. Nexwe em dê di bin potînen Jon-tirkînan de biheciqin.

Jixwe rêxistin û saziyên me kar û barên xwe dimeşînin. Divê gel wan hêzdartir bike. Her wiha li derveyî saziyan jî yekîtiya xwe çêbike û li hemberî êrîşan birêxistinî tevbigere.

divê li ku derê dibin bila bibin xwe bi hev ve girê bidin û xwe biparêzin.

Ji bo bersivdayinê divê em serî li gelek rîyan bidin. Lê divê em ne êrîşkar bin. Tenê di rewşa parastinê de bin. Heke êrîşek li hemberî me pêk hat divê em serî li dadgehên mafên mirovan, dadgeha Ewrûpayê bidin. Divê her mirovek û saziyek li warê xwe xwedî peywîrê be. Em dizanin ku ev gurgeboz nikarin pêka kurdan bînin. Lê divê neyê jibîrkirin ku

Ji Serokê Giştî yê PKK'ê Öcalan paketa çareseriyê: Kurd bo şer jî bo aştiyê jî amade ne

Serokê Giştî yê PKK'ê Abdullah Öcalan bi riya parêzerên xwe li ser çareseriyê kêşeya kurd bo ra-xala pakêteke çareseriyê ragihand û daxwaza otonomiyê kir. Pakêta ku ji 7 xalan pêk tê, li Hotel Internationala ya li Romayê roja 25'ê sermawezê ji aliyê parêzerên Öcalan Culiano Pisapia, Lunghi Sarageni û berpîrsê ERNK'ê yê Ewropayê Akif Hasan ve, bi civîneke çapemeniyê hate ragihandin. Çapemeniya cihanê bo civînê eleqeyêke mezin nîşan da. Lê medyaya Tirkiyeyê di weşanên xwe de behsa vê pakête nekir.

Kurd bo şer amade ne lê daxwaza me aşti ye

Di pakêta çareseriyê de Serokê Giştî yê PKK'ê Abdullah Öcalan bi awayekî tund li ser pêdiviya aşti û diyaloga siyasî rawestiyaye. Öcalan, li ser bin-geha xalên di pakête de diyar dike ku gelê kurd hem berdewama têkoşina çekdarî û hem jî aştiyê dixwaze. Lê ew dê aştiyê hilbijêrin û di rojên pêş de wê di kongreya xwe ya şeşemîn de vê yekê binixînin. Öcalan, di daxuyaniya xwe de balê dikişîne ser agirbesta dawîn û dide zanîn ku ew ne alîgirê şidetê ye û wiha dibêje: "Aliyê tirkan ji ber ku hebûna kêşeya kurd napejirîne, min bi terorîzmê tawanbar dike. Lê ya rastîn kêşeya kurd heye. Li Tirkiyeyê kurd qurbanên jenosîdeke xedar in. Tirkiye her daxwazeke li ser naskirina nasnameya kurdî diçewisîne û girtinên giştî pêk tîne. Ev yek ne tenê daxuyaniyên min in. Ewropa jî van yekan diyar dike."

Serokê Giştî yê PKK'ê Abdullah Öcalan di daxuyaniya xwe de balê dikişîne ser penaberîna kurdan û diyar dike ku înkarkirina kurdan li ber çavê herkesî tê kirin, vê yekê jî rê li ber koçberîna kurdan a ber bi qeraxên Îtalyayê ve vekirîye. Öcalan di dirêjahiya daxuyaniya xwe de wiha dibêje: "Me ji bo vê yekê serî hilda. Me gund û mirovên xwe parastin. Di vî şerî de bi hezaran mirovan jiyana xwe ji dest dan. Piştî ku me agirbest îlan kir, em bêhtir nêzikî çareseriyê bûn. Ji bo lidarxistina konferansekê navneteweyî têkilî bi hêzên politîk û şexsiyeten li Îtalyayê re hate danîn û biryar jî hate girtin. Lê piştî ku hikûmeta Yılmaz hate ser kar, her tişt guherî û bû wekî berê." Di daxuyaniya xwe de Öcalan dide xuyakirin ku bo çareseriyê kêşeya kurdî yan ew dê li serê çiyên bimana û şerê xwe bidomandana yan jî wê bang li Ewropayê bikirana. Ew, di de zanîn ku wan bo aştiyê xala duymîn gunçaw dîtine û ji ber wê yekê jî Ewropa tercîh kirine. Öcalan di pakêta çareseriyê de daxwaza piştigiriyê ji Îtalyayê dike û dixwaze ku ew piştigiriyê pêşnûmaya (tasarî) wî ya bo çareseriyê kêşeya kurd bike.

Öcalan, di dawiyê daxuyaniyê de balê dikişîne ser pêdiviya destpêkirina diyalog û pêvajoya politîk û wiha dibêje: "Divê ev pêvajoyê, di bin çavdêriya Yekîtiya Neteweyan û Yekîtiya Ewropayê de were meşandin. Bi vê riyê, dê hem di navbera gelê tirk û kurd de aşti û her wiha li Ewropayê û li Derya Spî jî aramî û ewlehiyê pêk were."

Piştigiriyê navneteweyî her zêde dibe

Piştî ku Serokê Giştî yê PKK'ê Abdullah Öcalan çû Romayê, ji aliyê dewleta tirk ve gelek senaryo hatin honandin. Lê li gorî rûdanên dawîn, piştigiriyê gelê kurd a bo Öcalan li seranserê cihanê û ji helwesta Ewropayê tê dîtîn ku ev senaryo di avê de çûne. Ji bilî PDK'ê hemû hêzên Kurdistanî, hêzên çepgir ên Tirkiyeyî, yên li Rojhilata Navîn hem jî yên li Ewropayê piştigirî dane helwesta Serokê Giştî yê PKK'ê Abdullah Öcalan. Digel van rûdanan, ji her aliyê Ewropayê, di serî de Papa piştigiriyê xwe eşkere kir û daxuyand ku divê kêşeya kurdî bi diyalogên politîk bê çareserkirin. Serokê Yekîtiya

Pakêta çareseriyê

Serokê Giştî yê PKK'ê Abdullah Öcalan daxwazên xwe wiha rêz kirine.

- 1- Li dijî herêmên kurdan rawestandina operasyonên leşkerî.
- 2- Pêkanîna vegera kesên ku ji cih û warên xwe hatine koçberkirin.
- 3- Rakirina sîstema cerdevaniya gundan.
- 4- Bêyî xerakirina sînorên Tirkiyeyê, ji bo herêma me dayina otonomiyê.
- 5- Tirk xwedî çî mafê demokratîk bin, bo kurdan jî dayina wan mafan.
- 6- Bi awayekî fermî naskirina çand, ziman û nasnameya kurdî.
- 7- Pêkanîna pluralîzmê (pîren-gî) û azadiya olî.

Ewropayê yê Serdemî û Serokomarê Fransayê Jacques Chirac, Rêxistina Sosyalîst Enternasyonal, ETA û Sinn Fein'ê jî piştigiriyê xwe eşkere kirin. Dîsa li Yewnanîstanê digel parlamenter û rêxistinên sivil ên demokratîk Sekreterê Giştî yê PASOK'ê jî piştigiriyê xwe ragihand.

Helwesta Tirkiyeyê

Digel rûdanên dawîn heta niha di helwesta dewleta tirk de tu tişt neguherî. Berevajî vê yekê ligel hemû piştigiriyê Ewropayê ya bo çareseriyê kêşeya kurd, dewleta tirk xwe li ker û koriyê datîne. Berî vêga bi demeke kurt Serokomarê Tirkiyeyê Süleyman Demirel



Parêzerên Serokê Giştî yê PKK'ê Culiano Pisapia û Lunghi Sarageni Paketa Öcalan a ji bo çareseriyê kêşeya kurd ragihandin.

çû Avusturyayê û li ser pîrsekê wiha got: "Li Tirkiyeyê kêşeya kurd nîn e, kêşeya terorê heye." Dîsa Demirel da xuyakirin ku bila kes bi wan re qayîşê neqşîne lewre artêşa wan pisportîrîn artêşa cihanê ye. Ligel van daxuyaniyan rayedarên dewletê li xwe mikur jî tî. Bo mînak Cîgirê Serokwezîrê Tirkiyeyê Bülent Ecevit da zanîn ku, Tirkiye di warê siyasî de li hemberî PKK'ê têk çûye.

Li aliyê din hin partiyên ku berê li ser kêşeya kurd xwedî zimanekî nerm bûn, vê dawiyê bi zimanê şerxwazan diaxivin. Li ser vê yekê rojnameger Cengiz Çandar wekî nimûne helwesta Partiya Fazîletê da û got ku her kes di de ber dilê kitleyên ku dîn û har bûne.

M. Kaynak: Ez Tirkiyeyê fêm nakim

Der barê vê yekê de em bi Mahir Kaynak re axivîn. Wî jî da zanîn ku ew politikaya Tirkiyeyê fêm nake û got ku ew ne bawer e Tirkiye bo kurdan xwedî politikayê çareseriyê be. Kaynak, politikaya Tirkiyeyê bo me wiha nixand: "Kêşeya ku tenê bi Tirkiyeyê ve girêdayî bû, îro hemû dinya nîqaş dike. PKK'ê dixwest xwe bike tevgerê siyasî. Di vî warî de gavên berbiçav jî avêtin. Li ber siyasîbûna PKK'ê tu asteng neman. Welatên Rojavayî, wê heta hetayê piştigiriyê kurdan bikin. Çûyîna Romayê ya Abdullah Öcalan jî pozîtîf e. Dewleteke ku ji PKK'ê hez neke jî, piştî vê yekê li dijî kurdan helwesteke negatîf nîşan nade. Dewleteke ku piştigiriyê kurdan neke jî mecbûr dimîne ku piştigiriyê wan bike. Ev qezencek e. Ji ber politikaya Tirkiyeyê ez gēj bûme. Baş e, me fêm kir ku tu li dijî PKK'ê yî. Lê tu hemû muxalîfan jî diçewisînî. Ew muxalîf li dijî PKK'ê be jî tu diçewisînî. Ev ne politîka ye."

Balkêş e wekî Mahir Kaynak jî diyar

dike, li ser kêşeya kurd sebra Tirkiyeyê bi kesî re nayê. Bo nimûne kovara Aksiyonê, ku xwe nêzikî helwesta dewletê dike, di hejmara xwe ya dawîn de li ser çûyîna Öcalan a bo Romayê dosyayêke berfireh amade kiriye. Di pêşgotina kovarê de tê diyarkirin ku li ser kêşeya kurd sebra dewletê bi tiştên herî biçûk jî nayê, divê dewlet li politikaya xwe ya li ser kurdan vegere. Dîsa di heman kovarê de ligel Serokê DKP Şerafettin Elçi jî hevpevyînek hatiye kirin. Elçi, bi awayekî şaş û metelmayî dide zanîn ku, her çiqas ew ne li dijî dewletê ne jî, dewletê jî bo partiya wan jî biryara girtinê daye. Elçi, piştî ku dide ber dilê dewletê, li ser pîrsekê diyar dike ku, ji bo çareseriyê kêşeya kurd dewletê jî bi li PKK'ê tu alternatîf nehiştine.

Atatürk jî demekê "terorîst" bûye !

Li aliyê din nûçeyêke ku ji aliyê ajansa dewleta Îtalyayê ANSA'yê ve hate ragihandin balkêşiya dirokê têr dide xuyakirin. Li gorî ajansê, dewleta Îngîlîz di navbera salên 1918 û 1923'yan de Atatürk bi navê 'Terorîst M. Kemal' îlan kiriye û loma jî wî, bo standina statûya siyasî serî li Îtalyayê daye. Dîsa bi pey nûçeya ajansê Atatürk jî aliyê Îngîlîz û Fransîzan ve wekî terorîstekî tê nasîn. Wê demê ligel vê yekê Atatürk dîsa jî xebatên xwe yên siyasî heta Komara Tirk ava bike li Îtalyayê didomîne. Tê ragihandin ku wê demê (1920) Wezîrê Karê Derve yê Îtalyayê Carlo Sforza di dayina mafê penaberiyê de bo Atatürk gelekî alîkarî kiriye. Her wiha ajansa ANSA'yê dide zanîn ku Tirkiye jî aliyê terorîstekî ve hatiye dameziran-din. Lê ew îro dibêjin em bi 'terorîstan' re rûnanin.

PKK berî vê bi 20 salan ava bû.

“Me digot qey ew dîn in”

Diyar e li ser dîroka PKK'ê gelek gotar, pirtûk û nivîs hatine nivîsîn. Di 20 saliya PKK'ê de me xwest, bi kurtahî li ser xalên dîroka PKK'ê yên ku zêde nehatine vekolandin, rawestî û ji bo xwendevanên xwe bidin ber ronahiyê.

“Me digot qey ew dîn in. Gava ez serê sibê rabûm nimêjê, li çiyê min şeş kes dîtin. Di wê sermayê de min nikaribû desmêjê bigirim, ew bi şev li derve diman û li ser kevîran radiketî. Her gav xortekî dirêj û ne qelaw serkêşî dikir. Carna ew didan sekinandin, kevir û çiya nîşanî wan didan û tişt ji wan re digotin. Dû re me bihîst ku ew serokê wan bû. Yanê ew APO bû.”

Zilamekî şêst salî dîtînen xwe yên der barê pêvajoya avakirina PKK'ê de bi van gotînen jorîn dianî zimên. Erê, PKK di sala 1978'an de hate damezirandin. Heta damezirandinê çi zehmetî kişandin? Çawa hatin ve rewşê? Di kîjan pêvajoyan re derbas bûn? Ev pirs hêjayî lêkolînê ne.

Serdema Girtîgehê

Di salên 1970'yî de têkoşîna çepgirî tirk bi pêş dîkeve. Serokê Giştî yê PKK'ê Abdullah Öcalan ji tevî konferansên Mayîr Çayan û kesên wekî wî dibê û di bin bandora wan de dimîne. Dû ve konferansê, ku li SBF'ê (Siyasal Bilgiler fakültesi) çêbû, Öcalan zêdetir ber bi têkoşînê ve çû. Dû van salan, heta girtina Deniz Gezmiş, İbrahim Kaypakkaya û qetilkirina Mahir Çayan ew sêmpatîzanê wan bû. Bi qetilkirina Mahir Çayan û hevalên wî re, li Siyasalê boykotek, ku Abdullah Öcalan jî tê de bû, pêk hat. Vê boykotê jiyana Abdullah Öcalan guherand. Piştî boykotê di 7'ê avrêla 1972'yan de tê girtin û wî di şînin Girtîgeha Mamakê ya li Enqereyê. Heft mehan li vê girtîgehê dimîne. Di vê pêvajoyê de têkçûna rêxistinên çepgir ên Tirkiyeyî dibîne. Abdullah Öcalan ve rewşê wiha tîne zimên: “Gava ew hatin girtin û ketin zindanê,

“Me digot qey ew dîn in. Di wê sermayê de min nikaribû desmêjê bigirim, ew bi şev li derve diman û li ser kevîran radiketî. Her gav xortekî dirêj û ne qelaw serkêşî dikir. Carna ew didan sekinandin, kevir û çiya nîşanî wan didan û tişt ji wan re digotin. Dû re me bihîst ku ew Apo bûye.

min di rûyê wan de têkçûn û binketin dît. Encama ku min jê derxist ev bû: Bêyî bingeheke xurt, domdarbûn û rêxistinbûneke xurt, ev doz naçe serî. Dîsa min rûyê leşkeriyê jî baş dît.”

Dîsa Serokê Giştî yê PKK'ê hestên xwe yên piştî derketina ji zindanê di hevpeyvîneke ligel Yalçın Küçük de wiha diyar dîke: “Gava ez ji zindanê derketim, min got: ‘Ji bo ku ez careke din neyê

girtin, çi pêwîst be ez ê bikim. Rêxistin pêwîst be rêxistin, partî pêwîst be partî û têkoşîn pêwîst be têkoşîn.’ Li ser vê dîtîne Yalçın Küçük wiha dibêje: “Ën me jî gava ji zindanê derdikevin, ji bo ku careke din neyê girtin, destê xwe ji her tiştî dişon.”

Di van salan de gelê kurd bi her awayî hatibû çewsandin û bi giştî ji kurdbûna xwe ne haydar bû. Lê Abdullah Öcalan bi

paş de kişandin. Di civînê de Serok Apo li ser bipêşxistina têkoşînê û birêxistinbûnê, sekinî. Xêynî van çend peyvan civînê zêde birêxistinî û xurt nîn bû.”

Înternasyonalîstiya PKK

Her çiqas Öcalan di vê civînê de xwestiyê ji bo avakirina rêxistinekê komeke saz bike jî, hetanî 76'an zêde li ser rêxistineke kurd nesekinî. Jixwe

tinên kurdan rapêçin, di sala 1976'an de pêngavek pêk anî û di vê salê de ber bi girseyibûnê ve çûn. Di sala 1976'an de sêmpatîzanê Halkın Kurtuluşu Fevzi Aslansoy ji aliyê faşîstan ve hate qetilkirin. Ji ber ku ew rêxistin xwedî lê derneket, PKK'yî lê xwedî derketin û ew birin li Sûrûçê defin kirin. Abdullah Öcalan ve çalakiyê wiha şirove dîke: “Ji ber ku kurd bû em lê xwedî derketin û me bir ew bi-



Öcalan li salên 80'yî ligel hevrêyên xwe tê dîtîn

derketina ji zindanê re rewşa gelê kurd baş dibîne û xebatên xwe zêdetir dîke. Di avrêla 1973'yan de di civîna li ber Baraja Çubukê de pêwîstiya têkoşînê zêdetir xwe dide der. Şeş kes tevî ve civînê dibin. Di vê civînê de A. Haydar Kaytan û Serokê Giştî yê PKK'ê Abdullah Öcalan amade ne. Xêynî Abdullah Öcalan û A.

MIT'a tirk ji di wê demê de biryareke sererast nade, ku ew ji bo gelê kurd têdikoşe an ji bo gelê tirk. Bi pey ve civîna ku li Bendava Çubukê pêk tê, Abdullah Öcalan li Enqereyê bi navê ADYÖD (Ankara Demokrat Yüksek Öğretim Derneği) komeleyekê ava dîke û di vê komeleyê de têkoşîna xwe didomîne. Di sala 1975'an de bi girtina ADYÖD'ê re xebata xwe ji bo têkoşîna gelê kurd gurtir dîke.

Di vê pêvajoyê de helwesta înternasyonalîst ya Öcalan xwe dide der. Ev feraseta înternasyonalîst, di kadroyên ku li der û dora Öcalan kom dibin de jî, xwe dide der. Wekî Kemal Pir dibêje: “Heta Şoreşa Kurdistanê çênebe, Şoreşa Tirkiyeyê çênabe” û her wiha gotînen Haki Karer minakên herî berbiçav in. Dîsa di roja îro de bi derketina Öcalan ya bo Ewropayê înternasyonalîstiya PKK'ê berbiçavtir dibe. Dîsa di nava PKK'ê de hebûna gerilayên ji gelên cuda, ve rastiye îspat dîke. Her wiha çalakiya xwefedayî ya gerilaya ARGK'ê Fatma Özen (Rojbîn), ku di 17'ê meha kewçêra 1998'an de li Çolemêrgê hate lidarxistin jî minakeke baş e. Lewre Özen bi eslê xwe ereb bû.

Dîsa Abdullah Öcalan û hevalên wî ji bo ku tevahiya neteweya kurd û rêxis-

nax kir. Çalakiyeke ciddî û politîk bû. Girseyek mezin hatibû. Hinek ji me hatin girtin. Dû re me kom şandin Kurdistanê.”

Civînen berî avabûnê

Di avrêla 1977'an de sefera Kurdistanê dest pê dîke. Ev sefer Qers, Agirî, Dêrsim, Çewlik, Amed û Dilokê digire nava xwe. Ev sefera ku li seranserî Kurdistanê pêk tê, dewleta tirk ditirsîne. Ji ber ku ev kom civînan çêdikin lewre li her derê bi dilgermî tînen hewandin û hejmara APO'ci û dilxwazên wan her diçe zêde dibe. Ev civînen, ku her carê bi beşdariya 50-60 kesî pêk tên, di 15'ê meha gulanê de bi dawî dibin. Öcalan li ser van civînan jî wiha dibêje:

“Bi îhtîmaleke mezin MIT'ê li van civînan temaşê dikir. Di dawiyê de Haki Karer li Dilokê şehîd bû. Em tirsîyan, me got vaye biryara îdama me rakirin.” Her çiqas êrişên dewletê tevî hêzên xwefiroş, li ser wan PKK'ê zêde bûn û bi destê Stêrka Sor Haki Karer hatibe qetilkirin jî, wan dest ji têkoşîna xwe nekişandin. Her wiha ji bo pêşerojê xebatên xwe domandin û ji bo layiqbûna şehadeta Haki Karer biryara avakirina PKK'ê dan. (Dê bidome)

AMADEKAR: CEMİL ANDOK

Rêzimanê kurmancî

- Wane 40 -

SAMÎ BERBANG

Têgihên rêzimanî

Bilêvkirin: Telafûz etmek

KîtandinHecelêmek: Peyv kîte bi kîte çawa tê parçekirin wê nişan dide.

Rastrnivîs (İmla): Awayê nivîsandina peyvê nişan dide. Celadet Bedirxan jê re vekît dibêje. Tirk "imla"ya erebî bi kar tînin.

Serastkirin (tasîh, redaksiyon): Nivîsek dema bê xwendin û çewtiyên rêzimanî û rastrnivîsî bîn rastkirin, ji vê yekê re serastkirin tê gotin. Ji ber ku di kurmancî de du dengdarên wekî hev nayên ba hev yanî di kurdî de "şedde" nîn e, peyva "serast" dibe serast.

Rengdêr (hevalnav)Sifat: Tiştê ku çawatiya navan nişan dide ango rengê navdêrê didêre rengdêr e. Hinek zimanzan jê re hevalnav dibêjin, di soranî de jê re awelnav tê gotin. Tirk "sifat" a erebî bi kar tînin.

Rengdêrên xwerû-Sade sîfatlar: Ev cure rengdêr ji aliyê bastûra (bunye) xwe ve tu qertaf nagirin, mirov nikare wan parçe bike. Bi tenê ji hêmanekê pêk hatine. Bo nimûne, peyvên baş, qenc, dema navdêrê bi me bidin nasîn rengdêrên xwerû ne.

Rengdêrên hevedudanî-Birleşik

sîfatlar: Ev cure rengdêr ji çend hêmanan pêk tê, hêmanek ji wan, xwediyê wateyê serbixwe ye, lê dema ew tînin hev, wateyê nû didin navdêrê. Bo nimûne: Pozbîlind. Rengdêrên pêkhatî-

Türetilmîş sîfat: Ev rengdêr ji çend hêmanan pêk tê, lê hin hêman bi serê xwe, ne xwediyê tu wateyê ne, ew paşgir an jî pêşgir in. Wekî: ba/w/î

Cureyên rengdêran

Rengdêrên rewşê-Nitelik sîfat: Mirov dikare jê re rengdêrên çawanîyê jî bibêje, ji ber ku çawatiya navdêrê nişan dide. Ev cure rengdêr di binyata xwe de rengdêr in, lê cureyên din ên rengdêrê di binyata xwe de ne rengdêr in, bi tenê dema dikevin ber navdêran, wan bi me didin nasîn, dibin rengdêr.

Rengdêrên şanîdanî-İşaret sîfatlar: Ev cure rengdêr dikevin ber navdêran û wan şanî mirov didin, ji ber vê yekê jê re rengdêrên şanîdanî hatine gotin. Her wekî berê jî hate gotin ev cure rengdêr di rastiya xwe de cînavkên şanîdanî ne. Lewre jî tevî rengdêr ji birên hevokê yên neguherbar in jî. Ew dibin du bir; yek ji

wan ditewe û bi xwe navdêrên piştî xwe jî ditewîne, yê din din jî natewe.

Rengdêrên jimarî-Sayı sîfatlar: Ev rengdêr jî di bingeha xwe de jimarnav in, dema dikevin ber navdêran dibin rengdêr.

Rengdêrên pirsîyarî-Soru sîfatlar: Ev rengdêr jî di binyata xwe de cînavkên pirsîyarî ne, lê dema ku dikevin ber navdêran û pirsên ku navdêrê bi mirov didin nasîn dikin, dibin rengdêrên pirsîyarî.

Rengdêrên nebinavkirî-Belirsiz sîfatlar: Cînavkên nebinavkirî dema dikevin ber navdêran dibin rengdêrên nebinavkirî.

Pileyên rengdêrê-Sîfat derecele-ri: Di kurdî de rengdêr sê pile ne.

Pileyê yekemîn-Birinci derece: Heke rengdêrê bi serê xwe bikeve ber navdêrê, çawatiya wê nişan dide, lê radeya çawatiya wê bi alikariya hinek qertaf û rengdêrên jimarî û nebinavkirî derdikeve holê. Dema mirov dibêje: 'hevalê qenc', ne diyar e ka çiqas qenc e. Ev pileya xwerû ye.

Pileyê rûberî-Karşılaştırma derecesi: Dema mirov navdêrê bi tiştê din re bide ber hev wê demê, pileya rûberî derdikeve holê. Pileyê

rûberî ji alikariya qertafa /tir/ û hinek rengdêrên nebinavkirî yên wekî "hinekî, gelekî, pir, hebekî, piçekî û hwd." yan jî rengdêrên jimarî: "du caran, sê qatî, Çar gavan, du tiliyan, deh metroyan û hwd."

Pileyê berztirînEn üst derece: Ev pile di tirkî de bi peyva "en" tê nîşandayîn, di almanî de jê re superlatîf tê gotin. Di nava çend tiştan de tiştê ku bi taybetiyê xwe di ser hemûyan re ye, bi alikariya vê pileya rengdêrê tê destnîşankirin. Di kurmancî de bi alikariya qertafa /tirin/ û peyvên "herî", "tewrî" tînin nîşandayîn.

HokerZarf: Her wekî çawa rengdêr navdêrê bi me dide nasîn, hoker jî lêkerê bi mirov dide nasîn. Mirov bi alikariya hokerê awayê pêkhatina kar fêm dike. Ji aliyê dem, alî û cih ve jî sergihayî dike. Ji ber sedema ku me li jor şîrove kir, ji hokerê re "hevalkar" jî tê gotin.

Hokerên çawanîyê: Ev cure hoker, awayê pêkhatina kar nişan dide, ew peyv dema dikevin ber navdêran dibin rengdêr, dema dikevin ber lêkerê jî dibin hoker. Bo nimûne peyva "bilind" dema tiştê nişan bide rengdêr e. Wekî "dara bilind" lê dema awayê kar nişan bide hoker e, wekî "bilind firiya".

Pêvajoya ku em tê de ne

MAHMUT KILINÇ



Êrîşa dewleta tirk a li ser Sûriyeyê û bi derketina Serokê PKK'ê Abdullah Öcalan ji Rojhilata Navîn, ji bo gelê Kurdistanê pêvajoyê nû dest pê dike. Wekî me, ev ji bo dewleta tirk jî girîng e. Dewleta tirk, li hemberî vê êrîşa nû, ji îro pê de gelo wê çî politikayê bimeşîne? Helwesta siyaseta kurdan de çawa bibe?

Derketina Öcalan, bi taybetî ji bo PKK'ê, bi giştî ji bo tevgera bakurê Kurdistanê, wê gelek bûyerên girîng derxîne. Jixwe ji destpêkê heta îro, di demeke gelekî kin de, wekî ku em dibînin bûyerên gelekî balkêş jî diqewimin. Heta ev tevlihevî hebe, dê guherandinên ku dewleta tirk negihîştîye, ku hesabê wan bike wê derkevin. Dewleta tirk, dixwaze xwe wekî dewletên ku hesabê hemû faktorên dikin û dût û dirêj difikirin, bide naskirin. Wekî pêvajoya ku bi êrîşa li ser Sûriyeyê dest pê kiriye, gelek caran rê li ber xwe şaş dike. Îro hem li derve hem jî li hundir, di gelek mijaran de ketiye tengasiyên mezin û rê li ber xwe xira kiriye. Bi êrîşên ku di-

be ser saziyên kurdan jî, wahşeta xwe eşkere dike.

Ji bo gelê kurd, bi her awayî têkoşîna neteweyî ronahî ye. Ango, di warê navneteweyî de, bi taybetî ji bo PKK'ê, bi giştî ji bo tevgera Bakur hinek nixandinên nexweş hene. Ev dîtî û şîrove li ser agahiyên ne objektîf û biteref tene kirin. Dewleta tirk di warê navneteweyî de li dijî têkoşîna neteweyî û ji bo lomekirina wê, hemû îmkânên xwe bi kar tîne.

Bi çûyina Öcalan a bo Îtalyayê re, têkoşîna neteweyî ya li Bakur di nav rojê siyaseta dinyayê de cihekî girîng stand. Ji îmajê ku dewleta tirk bi hezar derew û bi pereyên gemarî lê bar kiribû, li ser navê têkoşîna neteweyî, ber bi pejirandinê neke bi navê Têkoşîna Rizgariya Neteweyî ve gav diavêje. Jixwe dewleta tirk jî, li hemberî vê rewşê ketiye nav xemgîniyê mezîn û dest bi êrîşên li ser saziyên kurdan dike. Dixwaze heyfa xwe ji wan saziyên sivil hilîne.

Heta ez dikarim bêjim avakirina platformeke navendî ya neteweyî, wekî eniya neteweyî, careke din hate ber çavan ku gelekî pêwîst e. Bi taybetî jî, ji bo pêvajoyê siyasî û di nav siyaseta dinyayê de, ev pîvanek e.

Ji bo karê diplomasiya kurdan jî, derfetên pirtir û girîngtir derdikevin. Çembera ku li dor PKK'ê hatibû kişandin, bi derketina van derfetan û meşandina

karûbarê siyasî û diplomasiyê, wê rabe û şûna xwe bide pêwendiyên bi ber. Jixwe dewleta tirk dixwest ku Öcalan ji Rojhilata Navîn derkeve, lê neçe Ewrûpayê. Wisa tê xuyakirin ku hesabê Ewrûpayê nekîribû. Piştî ku dewleta Îtalyayê ji bo fêdekirina Öcalan, bersivê negatîf da dewleta tirk, êdî ew ketine qida ku Öcalan bi dizî bişînin welatekî, ku wekî marjinal tê naskirin. Heta, teklîfên aborî jî dikin; bi eşkere tehdît, bi dizî jî teklîfên bertîlan.

Vê pêvajoyê tiştê din jî eşkere kir. Careke din eşkere bû ku bêkesiya kurdan dibe sebeba gelek tiştên xeter û giran. Bi nîvpiştigiriya Serokwezîrê Îtalyayê D'Alema, ji aliyê ve tevgera kurdan kete qonaxê bilind û cihekî girîng stand, ji aliyê din ve jî di hezar babetan de rezîliya dewleta tirk eşkere kir. Eşkere ye ku ger hinek dewlet ji piştigiriya dewleta tirk dest bikişînin, hem ew qas êrîş nabin, hem jî ji bo çareseriyê gavê werin avêtin. Helwesta Îtalyayê, pêwîstiya siyaseta navneteweyî da ber çavan.

Di politikaya faşîst a dewleta tirk de du faktorên girîng hene. Yek, desteka navneteweyî, bi taybetî ya DYA'yê, ya din hevkarîya hinek kurdan. Ger ev herdu faktor nebûna, dewleta tirk nedikaribû ku ew qasî xirabî û gemariyê bike. Qenciyeke heye ku ev her du destek jî roj bi roj kêmbin.

Mustefa Eloş (Şêxmûs)

Axa miçiqî û her tenek xweliya wê, di nava xwe de diteqî, awirên wê melûl û hêstirên wê bêav mabûn. Tiştekek dixwest! Tiştekek dixwest ji bo tovê zerik, yê ku ji berbanga mirovahiye de di nava cergê xwe de veşartibû, bipişkivîne. Xweliya neçar! Roj bi roj ji dar û gihayên ku her dem rûyê wê şîn dikirin, gul û nêrgîzên ku bêhna xwe bi wan vedikirin, hilma xwe ya dawiyê distandin. Tiştekek dixwestin ku darên ku pelên xwe weşandibûn; wan bi şaxên xwe ve bêriya çûk û teyrikan kiribûn. Mîna ku bi ser rewşa xwe de bigirin wisa çiqilrût û stûxwar bûbûn...Tiştekek dixwest, da ku fêkiyan bidin....

Her tişt bêrih û bêagir mabû. Her tiştî û her kesî tiştekek dixwest: Xwîn, rih, jiyana û çek dixwestin....! Jixwe "Rih, jiyana, çek piroz in." Piştî ku tav ji Cû-

Hevalê Şêxmûs (Mustefa Eloş) ji li ser axeke wiha dijî. Wî, gotina Zeredestê Kal başbaş fêm kiribû. Lê ji bo ku xwe bigihîne Mirovê Mezin, dil û mêjiyê xwe vekiribû û mîna evîndarekî dilbibirîn, berê xwe dida fikr û ramanên Serokatîyê. Tevî ku alewî bû, li cem dilê wî her kes yek bû. Lewma pê dizanî ku her Kurdistanîyek şêr û piling e. Lê ev yek, dema rihê mirov bi Zeredestîyê were paqijkirin, bi ezmê Hz. Elî were dagirtin û bi zanebûna Zeredestê Hemdem were xemilandin, mimkûn e.

Xwendin ji xwe re kiribû kar

Hevalê Şêxmûs dil kiribû bibe xizmetkarê bax û bostanên Welatê xwe...Bibe notirvanê çûk, xezal û bil-

Hevalê Şêxmûs di destpêka sala 1991'an de, piştî ku li Akademiya Mahsûn Korkmaz dewreyek perwerdehî dît, cardin vegeriya Efrînê. Lê ew ketibû taya çûyina bakurê welêt, da ku tola Nûrî Dêrsimî hilde. Ew, heya tîrmeha 1992'yan li Efrînê ma. Piştê derbasî bakurê welêt bû. Wî, di mercên herî dijwar de jî xem nedixwarin û pêşengiya hevalên xwe dikir.

wîn bala gel dikişand û gel ji ber kesayetiya wî, bêhtir bi Partiyê ve dihatê girêdan.

Malbata Hevalê Şêxmûs malbateke welatparêz bû û alîkariya tevgerên Kurdistanî kiribû. Dema agirê Mazlum û çaran tevî rihê wî bû, rihê wî paqijtir û bi hêztir bû. Heriya sar bi agirê dilê xwe germ dikir. Her diçû çavên wî ji ber pir xwendinê jar û lawaz dibûn. Lê ji ber birîna dilê xwe pêjna vê yekê nekiribû.

Hevalê Şêxmûs zarokatiya xwe bêdê, sêwî borandibû. Lê dema Dayika Mezin nas kir, bi dilgermî berê xwe da wê. Hevalê Mustefa bi zanebûna xwe ya ku ji perwerdehiyê wergirtibû, dîtî û ramanên Serokatîyê di nava gel de diçandin. Li aliyê din ji xebata reformîstên kurd gelekî aciz dibû. Çawa ku kula hozanê nemir Mihe-med Şêxo Felek bû, kula Hevalê Şêxmûs jî reformîstên kurd bûn. Her tim şerê wan dikir û bi zimanekî tûj û jixwebawer bêwestan û rawestan li dijî reformîsttan radibû. Lewre bûbû tirs û sawa dilê reformîstan.

Dema Akademiyê

Hevalê Şêxmûs radikalbûna xwe ji baweriya alewîtiyê wergirtibû. Lê bi vî awayî xebata wî neçû serî. Piştê dema radikalbûna xwe bi zanistiya Partiyê xemiland, bi berpirsiyariyê mezî karûbarê xwe gerand û bi awayekî serketî bir serî. Dema xebatê, alîkariya hevalên xwe dikir û her wiha jî ji wan daxwaza alîkariyê kir. Ew, mirovekî dilovan û sergirana bû. Lewma her kesî hez jê dikir.

Hevalê Şêxmûs di destpêka sala


1991'an de, piştî ku li Akademiya Mahsûn Korkmaz dewreyek perwerdehî dît, careke din vegeriya Efrînê. Lê ew ketibû taya çûyina bakurê welat, da ku tola Nûrî Dêrsimî hilde. Lewre bêhtir dixwest xebata xwe li Bakur bimeşîne. Ew, heya tîrmeha 1992'an li Efrînê ma. Piştê derbasî bakurê welêt bû. Hevalê Şêxmûs li vê derê jî ji bo hevalên xwe bûbû kaniya dilgeşî û moralê. Di mercên herî dijwar de jî xem nedixwarin û pêşengiya hevalên xwe dikir.

Yek ji taybetiyên herî berbiçav ên Hevalê Şêxmûs, çekperweriya wî bû. Ew, bengî û evîndarê çeka azadiyê bûbû. Rojê sê çaran çeka xwe paqij dikir. Peyre maçî dikir û li nava xwe girêda. Lewre BKC bi awayekî şarezane û serketî dixebitand. Ji bo wî, çek ronahiya gelê wî bû. Çawa ku Zeredest digot: "Rojê sê çaran berê xwe bidin tavê û dawiyê axê maçî kin." Hevalê Şêxmûs jî ji bo gelê Mezopotamyayê bigihîne jiyana wekhev û azad, çeka xwe maçî dikir.

Wî, tevî hevalên xwe dixwest ken li rûyê zarokên Welatê Rojê vegere û dilê dayikan hênik bike. Lewre ditîbû: Dayikên Kurdistanê li şûna ku zarokên xwe hînî gul û nêrgîzan bikin, ew hînî bombe û firokan dikirin, da ku xwe jê biparêzin. Her wiha dayikên Kurdistanê li şûna ku zarokên xwe hînî dengê dengbêj û çûkan bikin, ew hînî dengê keleş û topan dikirin. Ev yekên hanê, di dilê wî de bûbûn kul û nifrîna wî dijwar dikirin. Dilê wî ketibû devê BKC'ya wî. Ev nifrîna di her livbaziye de bi qehremanî bi ser dijmin de vedireşand.

Hevalê Şêxmûs di roja 6'ê cotmeha 1992'yan de li Çiyayê Osmanîyê di şerekî pir dijwar de tevî serleşker Hevalê Haydar û hevalên Rojhat, Sercan, Behzat, Yado tevî karwana pakrewanên Kurdistanê bû. Sed mixabin şahadeta wan hevalan ji ber xiyaretê pêk hat. Wan şeş lehengan axa miçiqî av dan, bayê sekinî livandin, ava herimî paqij kirin, çemên ji hev şerm dikirin bi hêz kirin.

Asîmanê Mezopotamyayê wê rojê bi şeş stêrkên nû geş bû. Wan şeş stêrkan bi xwîna xwe sînorên dagirkeran pelişandin.



Hevalê Şêxmûs pê dizanî: Dayikên Kurdistanê li şûna ku zarokên xwe hînî gul û nêrgîzan bikin, hînî bombe û firokan dikirin, da ku xwe jê biparêzin. Lewre dilê wî ketibû devê BKC'ya wî. Ev nifrîna di her livbaziye de bi qehremanî bi ser dijmin de vedireşand.


diye rabû, ev rastî nişanî her kesî da. Ji wê rojê pê ve bi hezaran keç û xortên ciwan ji bo ku axê aş, ava herimî paqij bikin û hêza wê careke din bidinê, ji bo darên zozanên niştîman bixemilînin, her yekî xwe kir pelek ji wê darê re. Mîna dara heyatî xemilandin... Wan êdî fêm kiribû: "Dema mirov dimire, hestiyên wî tevî goşt dibin ax, xwîn dibe av, porê wî dibe dar û rihê wî dibe agir. (Zeredest)" Ev zanebûn bi roja mîladê û bayê wê re li her çar hêlên Welat belav bûbû û hemû mêrxas û lehengên gelê me pê hişyar bûbûn.

bilên zozanên xwe. Dixwest hilma axê, tova şitildayî bi hêz bike û siya wê fireh bike, da ku hemû mirovahî di bin dara azadiyê de cihê bigire. Ji bo pêkhatina van tiştan jî karîna û zanîna pêwîst bû. Çawa axa tîbûyî avê vedixwe, Hevalê Şêxmûs jî, bi aramiyê mezî, pirtûkên Serokatîyê dixwendin. Lewre pê dizanî ku dar yekcar fêkî nade. Xwendin ji xwe re kiribû karekî bingehîn. Bi taybetî li pirtûkên li ser dîrokê hûr û germ dibû. Li aliyê din mîna şalûrekî di nava gel de diaxivî û karê propagandayê digerrand. Zarşêrîniya Hevalê Şêxmûs mîna Seydayê Cegerx-

□ 3.12.1994

Rojnameya Özgür Ülke hate bombekirin

Rojnameya Özgür Ülke, di 3'yê berfanbarê de, di saet:3.30'ê şeve de hate bombekirin. Bombeya ewil li merkeza wê, li taxa Cağaloğlu, ya duduyan li cihê tîprêziya rojnameyê, li taxa Kadırgayê û ya sisêyan li buroya rojnameyê ya enqereyê teqiya. Di vê teqîhê de xebatkarê rojnameyê Ersin Yıldız (32) mir û 19 kes birîndar bûn.


BÛYERINE JI DÎROKÊ

□ 2.12.1993

Li Parisê meşa mezin

Li Paytexta Fransa Parisê zêdeyî deh hezar kurd, tirk, ereb û fransîz ji bo vekirina komeleyên kurdan ên li Fransayê ku, ji aliyê dewleta fransa ve hatibûn girtin û berdana bist kesî meşeke mezin li dar xistin. Meş li Meydana Republique yê dest pê kir û li Meydana Bastilayê bi dawî bû. Nêzi sih rêxistinê kurd, tirk, ereb û fransîz beşdarî meşê bûn.

Rojnameger Varlık Özmenek: Girtina rojnameyan cezakirina xwendevan wan e



Nivîskarê Ü. Gündemê Varlık Özmenek, dibêje "ji ber ku rojnameya min hatiye girtin, ez li cihekî din nanivisînim"

Li Zanîngeha Azad a Stenbolê vê şemiyê konferansê bi navê "Terorîzma çapemeniyê û mafên mirovan" hate lidarxistin. Di konferansê de Varlık Özmenek berî ku dest bi axaftina xwe bike, behsa jiyana xwe û rojnameyên ku tê de nivîsiye wekî Ü. Gündem û Demokrasiyê kir û got: "Min di 9'ê kewçêrê de li Enqereyê daxuyaniyeke çapemeniyê li dar xist. Di wê daxuyaniya xwe de min gotibû eger ev rewş bidobe, ezê têkevim gireva birçibûnê. Ev semîner, panel û konferans jî bîngeha vê soza min in."

Özmenek di serî de bal kişand ser terorîzma ku çapemeniya tirk dimeşîne û wiha got: "Di şertên navneteweyî de bultena sor di her warî de heye. Di qaçaxçîtiya eroînê û ya çekan de heye, gerek di çapemeniyê de jî hebe. Ji ber ku terorîstên çapemeniyê zêdetir in" Wî wekî mînak jî Güneri Cıvaoglu, Ali Kırca, Uğur Dünder, Reha Muhtar û hwd. dan û diyar kir ku îro li rûyê dinyayê tu rojnameger pêncî hezar dolar an heştê hezar mark meaşî nastîne. Li gorî Özmenek ji bo ku ew qas meaşê bê standin, ji bilî karê rojnamegeriyê, gerek tiştine din jî bêne kirin. Ev jî kifş e.

Rojnameger Özmenek, bal kişand ser birîndarkirina Akın Birdal û wiha got: "Li Tirkiyeyê çapemenî di destên hêzên nehênî de ye. Hin sazî an şexsan wekî hedef nîşan didin û bi dû wê re jî yan sazî tînen bombekirin, an jî tîne asêkirin. Şexs be jî tînen kuştin an birîndarkirin." Wî wekî mînak jî bombekirina Özgür Ülke, kuştina rojnamegerên kurd, girtina Ragıp Duran û birîndarkirina Akın Birdal nîşan da. Özmenek bûyerên bi dû birîndarkirina Akın Birdal re hatine holê wekî neynikê nîşan da û wiha got: "Gerek çapemenî mesajên Komeleya Mafên Mirovan bide civakê, dîsa li Tirkiyeyê wekî her tiştî berevajî vê çêbû û mesajên kujeran, faşîstan dan civakê.

Çapemeniya tirk jî ji Komeleya Mafên Mirovan re got: 'Komeleya Qesaban.'

Özmenek tînkiliya çapemeniya tirk û civakê bi wêneyekî nîşan da. Li gorî wî, car caran namûs, ehlaq, şeref çî li ser navê mirovahiyê hebe, tînen pelçiqandin û deng jî ji çapemeniya tirk der-nakeve.


Di reklamên tirkan de jî şovenîzmeke mezin heye

Rojnameger û rêvebirê Komeleya Mafên Mirovan yê Navenda Giştî Varlık Özmenek wiha berdewam kir: "Di rojnamegeriyê de çil û yek ode hene, lê ji bo rastiyê divê odeya çil û yekem were vekirin." Li gorî wî di reklamên tirkan de jî şovenîzm û faşîzmek gelek mezin heye. Wî wekî mînak reklama "Tık tık eyi günler" da û got "heger dewlet nehêle gelê kurd bi zimanê xwe bipeyive, wê bi tirkiyeye wisa xerab biaxeve. Ev gelekî normal e." Li gorî wî vê rewşa ku didin nîşan, kêfa tirkan bi kurdan tînin û bi rûmetên wan tê listin. Özmenek got ku rejîma li Tirkiyeyê heye, ne faşîzm e, ne kapîtalîzm e, ne jî împeryalîzm e. Tiştêkî ne diyar e.

Varlık Özmenek pêvajoya dawîn a serdana Serokê Giştî yê PKK'ê Abdullah Öcalan a Romayê jî nirxand û dîtînen xwe wiha anîn zimên: "Dixwazîna reşahiyeke gelekî mezin li ser civaka tirk, kurd û gelên din bibarînin, hovîtiya xwe tîxin nav gelan, lê ez bawer nakim ku vê carê bi ser bikevin. Civakek nexas afirandîne û hey dibêjin 'kes nikare kevîrekî ji me bistîne'. Özmenekê dibêje 'kevîrê we serê we bixwe.'

Varlık Özmenek axaftina xwe wiha qedand: "Ev rayedar dixwazîna gelên hemberî hev, cihê ku di çopa dîrokê de heq kirine zû dereng wê têkevinê."

A. WELAT /STENBOL

ÇAVDÊRÎ**Roja me hilat**

SERKAN BRÛSK

Roja îne bû. Ez hîna nû ji kar derketibûm. Ji bo ez di wextê xwe de bigihîjim studyoyê, min hinekî lez dikir. Ji ber ku min ji hevalê Aytekin re soz dabû ku ez dê saet li duwazdehan li studyo bim. Bi vê lezê min deriyê studyoya Med-Tv vekir û ez ketim hêwana wê. Min bi dengê bilind silav da hevalan lê bersiva hevalan nehat guhê min jî. Dengêkî wisa ji wan derket ku guhên herî hesas û mûç jî, nikarin bibihîzin. Pê re min fêhm kir ku tiştêk ne li rê heye. Min jî wekî wan kir. Li televizyona tirkan nêrî. Dema spîkera NTV dest bi nûçeyaya xwe kir, dengê min jî, ji bo çend saniyeyan vemirî. Lê piştî çend saniyeyên din bawerîya min kete dewrê. Dengê min vebû. Peyva pêşî ku min kir ez bawer im ev bû: "Derewan dikin. Lewra berî ku ew hikûmet (a Îtalya) were ser hukum heyetek ji wan çûbû ba Serok." Hevalên li studyo li min vegehandin ku televizyona me jî behsa tiştêk wiha kiriyê lê gotiyê ku berpirsiyarên tevgerê gotine haya hikûmetê ji hatina serok heye. Telefonek li pey ya din ji me re dihat. Ji her perçeyên Kurdistanê. Hinek kelogirî dibûn, hinekan digotin ku ew ji bo her tiştî amade ne û hinekan jî pêşniyaz, ji bo çalakiyan dianîn.

Roja şemiyê, komele tije bû. Her kesî ji hev dipirsî ka em çî bikin. Hevalan gotin ên dixwazîna û dikarin, dikarin herin Romayê. Hema di cî de nêzikî sed û pêncî kesî berê xwe dane Romayê. Yê me jî îmkanên me yên çûnê tunebûn. Me jî dest bi greva birçibûnê kir. Greva me bi çêşeke mezin dest pê kir û hîna jî berdewam dike. Ez bi xwe, heft rojan di grevê de mam. Ji ber karên me yên înstîtuyê û organên din ez fitirîm. Ji roja ku greva birçibûnê li komeleya Stockholmê dest pê kir û heta niha çûn û hatineke ku heta niha kesî nedîtiye pêk tê. Hemû rêxistinên siyasî (ji bilî PDK), komeleyên civakî, kesên serbixwe, nivîskar û hunermend hatin serdana me. Ne tenê raya giştî ya kurdan. Di heman demê de çapemenî, siyasatmedarên swêdî jî hatin û çûn. Ev cara pêşî e, ku çapemeniya Swêd ev qasî eleqe nîşanî me dide. Televizyona wan a Yekê ku ya dewletê ye, hate nav me. Dîsa radyoya dewletê li nav me weşaneke zindî kir. Yek ji mezintirîn televîzyonên taybetî Kanala Çaran, hate nav me û bi hevalên me re hevpeyvîn çêkir. Ev hevpeyvîn di televîzyonê de jî hatin weşandin. Hevalên di grevê de di nav xwe de wiha digotin: Berê em diçûn ber piyên wan, em diçûn avahiya televîzyonan da ku bi me re hevpeyvînan çêkin, lê wan ji me re digot ger hûn ji vir neçin, em dê we bi zora polîsan ji vir derînin.

Her wiha partiyan siyasî yên Swêd jî piştigirîya xwe ji me re bi rê kirin. Partiya Sosyalîst a Swêd endamekî xwe bi rê kir û li komeleyê axivî. Partiya Çep û ya Keskan bi awayekî vekirî piştigirîya xwe pêşkeş kir.

Moralê gel di van heft rojan de mirov nikare bi tu awayî bipêve. Tarîtiya hezar salan bi nûçeyên ku ji Romayê dihatin ronî dibû. Em bi hatina nûçeyan di ciyê xwe de nedisekinîn. Devên me ji kêfan re li piştî guhên me bûn. Riya Serokê me ku temsîliya çil milyonî dike, vedibû û em jî şahidên van rojan bûn.

Lê li gel van hemû nûçeyên dilxweş nûçeyên ku ji welêt dihatin bi rastî jî em diêşandin. Dema me hemwelatîyên xwe di nav wan seyan de didît, kîn û neftera me bi carekê re bilind dibû. Gelî hemwelatîyên me yên li welêt, bila hûn vê baş zanibin ku ev roj dê derbas bibin, rojên xweş ên me ne. Hinekî din jî li ber xwe bidin.

Serokê Giştî yê PKK'ê Abdullah Ocalan:

Ez dixwazim di warê rola xwe pêk bînim

Ev hevpeyvîn, rojê 27'yê sermawezê di rojnameya Çîroka Politikayê de, ku li Almaniyayê derdikave, hate weşandin. Li ber girîngiya hevpeyvîna û her wiha ji bo ku gelek kurd te bepar mane, me hevpeyvîn bo kurdî wergerand û weşand.

Ö.P: Serokê birêz, raya giştî bi hatina we ya bo Îtalyayê gelekî şaş û metel ma, lewma pîrsa rewşa nû û sedemên wê dike. Hûn piştî nexweşiya di navbera Sûriyê û Tirkîyeyê de ji Sûriyeyê derketin. We, diyar kir ku ev rewş, bi gerandina dek û dolabên mezin, pêk hatiya. Hûn dikarin bi awayekî berfirehtir vê yekê bidin xuyakirin?

→ Nexweşiya dawîn a di navbera Sûriyê û Tirkîyeyê de û armanca wê ya pêşîn, ku tasfiyekirina min bû, mijareke gelekî berfireh û hêjayî lêkolînê ye. Girîngiya vê bûyerê, her ku çû dê zêdetir berbiçav bibe. Her gava ku şaş û çewt bihata avêtin, wê bikira ku şerê herêmi rû bide. Vî şerî, ji ber tevger û helwesta min rû neda. Planekî wisa hatibû gerandin ku, li ber dest tu alternatîf nehiştibû. An îmha an jî teslîmîyet. Ji ber ku teslîmîyet ne mimkûn e, bêyî îmhayê tu alternatîf nedima.

Di vê bûyerê de, rola peymanê, ku di sala 1996'an de di navbera Îsraîl û Tirkîyeyê de hate girêdan, mezin e. Bi vê peymanê, di warê cihanê de piştgiriyeke xurt a DYA (CIA) û MOSSAD'ê hate standin. Di warê navxweyî de jî alîkariyeke teknîkî hate kirin. Li aliyê din

xwestin ku vê hevalbendiyê bi "Serokatiyeke hevalbend a kurd" xurtir bikin. Peymana Washingtonê bo vê yekê hate girêdan û armanca hêzeke alternatîf bû.

Lê bûyer bi dilê van dewletan neçûn serî. Lewre helwesta Sûriyeyê, ya ku xwe wekî bi paş de gav avêtiye nîşan da û helwesta min diyarker bû. Planên ku wan gerandin neçûn serî. Li ser vê yekê, helwesta Simitis a li Balafirgeha Atînyayê gelekî girîng e. Dema aliyên bincilkirî yên vê helwestê werin xuyakirin, dê gelek tişt zelal bibin. Her wiha mirov dikare heman gotinan ji bo Serokwezîrê Rusyayê Prîmakov jî bîne ser zimên. Hem Dûmayê hem serwîsên navxweyî û derveyî yên ewlekariyê û heta Serokatiyê jî nedixwest helwesteke negatîf bigire. Lê li ser gotinên Prîmakov ên ji bo DYA û Tirkîyeyê, alozî û nexweşiyeke

gelekî girîng in. Lewma bi awayekî gelekî karîger bi kar anî. Di rastiya xwe de helwesta nehewandinê rû nedaye. A rastir li gorî demê helwest hatiye diyarkirin. Lewre helwesteke tund û tûj li holê nîn e.

Ö.P: We, ji ber kîjan sedem û rûdanan biryara hatina bo Îtalyayê girt?

→ Biryara Îtalyayê ya bo hewandin û nehewandinê min, girêdayî faktorên pozîtîf ên ku min behs kiribûn e; Giranbihayiya dîrokî, dilgermiya gel ya demokratîk, helwesta hikûmetê a demokrat û her wiha hiqûqperweriya temendirêj û dîrokî, kir ku ez her tim baweriya xwe bi biryara hewandinê bînim. Ez tu caran pê ne bawer im ku, Îtalya min li Almanya ango Tirkîyeyê vegefine.

A rastir, ji bo ku ez zordarî û terora

'Têkoşîna çekdarî hinekî jî bêhemdî me pêk tê. Li hemberî hêzeke ku agirbestê qebûl nake, doza qirkirina me dike an jî xwespartinê dide ber me, ma ji xweparastinê pê ve tu alternatîfên me dimînin? Niha hedefa me ya pêşîn, li hemberî tevgerên îmhakirinê (ku diyar e dê zivistanê jî bê rawestan bidomin), liberxwedan û têkbirina wan e.'

mezin peyda bû. Dûmayê bi awayekî herî xurt piştgiriya xwe bo me ragihand. Lê di gerandina planê de Prîmakov li cem DYA û Tirkîyeyê cih girt. Bi baweriya min, Prîmakov ji ber krîza aborî ya li Rûsyayê bi vî awayî tevgeriya. Dibe ku krediya ku DYA daye Rûsyayê û soza Mesut Yılmaz a ji bo 800 milyon dolaran helwesta Prîmakov diyar kiribe.

Ö.P: Hûn dikarin helwesta Rûsyayê berbiçavtir bikin? Lewre Tirkîye keysa xwe lê tine û dibêje ji ber helwesta Tirkîyeyê hûn ji Rûsyayê derketinê.

→ Ji hewandin û nehewandinê min, lihevnekirina Parlamento û Hikûmetê, taybetiyên rejîmên totalîter û kesên ku hînî şantaj û bertûlên Tirkîyeyê bûne, di vî warî de xwedî rol û hêz in. Bi dîtina min di vê yekê de rola krediyên DYA'yê

xedar a li ser çand û gelên dergûşa şaristaniya Mezopotamya û Anatoliyayê bo Îtalya û Ewrûpayê diyar bikim, hatime vê derê. Her wiha ez dê bidim xuyakirin, ku çawa rejîmek ev 75 sal in bi dek û dolaban bi rê ve tê birin. Dîsa, ji bo ku ez rola xwe baştir pêk bînim, dê di vê yekê de berpirsiyariya Ewrûpayê jî berbiçav bikim. Divê neyê ji bîr kirin, gelên herî kevnare yên cihanê ermenî, aşûrî, grek (xiristyanên yekemîn) ji aliyê barbarîzma tirkan ve ji holê hatin rakirin. Ger em bi ser nekevin, dê kurd jî wekî gelên kevnare yên din, tevî karwana gelên wînda, bibin. Dîsa Împaratoriya Romayê ya mezin jî ji aliyê barbarîzma tirkan ve hatiye têkbirin. Li ser vê yekê divê îtalî terorîzmê mehkeme bikin. Ji bo ku ji her du aliyan hesap bistîne, divê li gorî pîvanên hiqûqa xwe ya mezin li Romayê mehkemeya navneteweyî ya mafên mirov û gelan ava bike. Îtalya divê bi vê yekê bikaribe. Lewre ez li aliyekî jî ji bo vê yekê li vir im. Ez dê her tim li hêviya vê yekê bim. Gelo dê TC were?

Hatina min a bo Îtalyayê ne ji neçarî


û bêgaviyê bû. Jixwe dema ez ji Îtalyayê derketim, armanca min a polîtîk a pêşîn bû. Lê hinekî ne bi awayekî aloz û nesaz pêk hat. Wekî diyar e, bingeha Yekîtiya Ewrûpayê li Romayê hate danîn. Dîsa helwesta civak û hikûmetê ya zelal, nêzîktêdayina hikûmetê ya demokrat û hebûna gelek mebusên îktîdar û muxalefetê yên dost, kir ku em bi cesaretir hereket bikin. Li aliyê din ji bo kurdan her biryara dîrokî riskên mezin di nava xwe dihewîne. A niha ji vê pê ve tu çare û rê xuya nakin.

Li vê derê, wê li ser bingeha ku Împaratoriya Osmanîyan û TC lê hatiye danîn, bihata rawestandî. Ji ber ku armanca mezin bû, hatina bo Romayê, ku qet ne li ser bala me bû, pêk hat. Ev dema hanê ku em a niha dijîn, di nava hemû demên dîrokî yên herî girîng de, yek ji yên herî girîng e. Ez lê dixebitîm ku peyveke ne di cih de bi kar neyînim û bi qasî kuliya derziyê be jî gaveke şaş neavêjim. Di vî warî ez heta hetayê bi xwe bawer im.

Li aliyê din ger realîteya cihanî bêje 'di ferhenga me de bo kurdan cih nîn e', dîsa jî ez dê hêvîdar bim û her rê û çareyê biceribînim. Ger ev bibe mirineke serbilind û bi rûmet, dê çêtir û hêjatir bibe. Lê wê teqez cih û rê bê vekirin. Lewre her çiqas ji hezar dozan yek be jî, Dadgeha Mafên Mirovan ya Ewrûpayê TC wekî sûcdar destnîşan kir. Em ketine halê bêkes û bêabûqatan.

Ö.P: Serokê birêz, gelê kurd matmayî ye. Lewre li cem gelê kurd hûn û Kurdistan yekpare ne. Ji ber sedemên siyasî be jî, derketina we ya bo Ewrûpayê tesîreke çawa li we kir?

→ Dema ez bêjim rewşa hestiyarî ya pêvajoya ku ez tê re derbas bûm (9 kewçêr 18 Sermawez), xwedî taybetiyeke kûr û trajîk e, dibe ku kes pê serwest nebe. Her wiha dibe ku di tu berhemên edebî û hunerî cihê wê nîn be. Rewşeke wisa ye ku, tu dibê qey ez ji bexçeyekî ku min çil salî bi kedekê mezin û bedew afirandiye, qut dibim û ji nişke ve bêyî dilê xwe û bêtedvîr dikevim nava valahiyeke fizîkî. Di vê merhaleyê de divê qehreman teqez qesta mirina trajîk bike. Ji bo vê jî, ne şansê min heye ne jî şexsiyeta min rê dide vê yekê. Li holê rewşeke ji trajediyê cuda heye. Her çiqas ku ez bi hemû karîna xwe li dij derketim jî, xweşewitandina du ciwanên kurd (Tayhan, Jêhat) ên ku li cem min bûn, bi her awayî trajedî ye. Li vê derê gotinên ku



siyasî de

‘Dema dor li pisîkekê jî were tengkirin, wê bi pencên xwe li ber xwe bide. Lê ez dixwazim di warê siyasî de rola xwe bi cih bînim. Li şûna şideta ku ne çare ye, bi zimanê politîk doza xwe bibim serî. Divê em jî ber sedemên cur be cur rê nedin ku aliyên şer xwe jî rastiye bidin alî. Ji ber ku mesele bi pêş ve avêtinê naçe serî.’

berbiçav dibin ev in: “biserneçûna karên nîvcomayî”, “hêrs û gira milîtanê/a ku, xweşewitandin jî di nav de ku her tiştî dide ber çavê xwe, lê tevî hemû îmkanan di meşa serkeftinê de bi ser nakeve”, “ji bo jinan pêkneanîna gotin û tevgerên pêwîst”, “Îxaneta ku bêhna civaka kurd çikandiye” û tevî dimenên Kurdistan û gerîla pêşkeşkirina kasetê ‘Delalê Derweşê Evdî’ ku min wekî kêmasiya demekê, bêhemdî xwe lê guhdarî kiriye.

Di vê merhaleyê de ez nikarim xwe ragirim lewre ji dil û can vê sloganê dubare dikim: “Serketin ji her demê nêzîktir e.”

Ö.P: Serokê birêz, tevî hemû komployên mezin ên Tirkiyeyê jî, gelo agirbest hîna jî didome?

⇒ Agirbesta me ya yekalî hîna jî didome. Rewşa ku em tê de ne, ne dişibe ÎRA'yê ne dişibe Baskê û ne jî gerîlayên Kolombiyayê. Divê ev baş bê fêmkirin. Hêza li dijî me bi awayekî gelekî eşkere dibêje: “Kêşeya kurd tune!” û dixwaze vê yekê bi tevgera îmhakirinê bibe serî. Ev neheqiyeye mezin e. Divê konferanseke navneteweyî vê yekê berbiçav bike. Her wiha divê pîvan û rêçikên Neteweyên Yekbûyî ji bo kurdan jî werin meşandin. Ger di vî warî de em bi ser bikevin, têkoşîna çekdarî nabe mesele. Ku Tirkiye operasyonên xwe rawestîne, pozê kesekî jî xwîn nabe û guleyek jî ne-teqe. Heke Tirkiyeyê digel me rûnenê, dê karê îmhakirinê bidomîne. Dîsa Kurdistan dê were valakirin. Dema tevî xizani û belengaziya xwe jî bi hezaran kes werin Romayê û ji çil kesî zêdetir mirov xwe bişewitîne, ev serhildêrî û berxwedêriya gelekî nîşan dide. Ku ez li dijî vê politikayê derkevim jî, ez dê çi qas bi ser bikevim?

Domandina û nedomandina têkoşîna çekdarî hinekî jî bêhemdî me pêk tê. Li hemberî hêzeke ku agirbestê qebûl nake, doza qirkirina me dike an jî xwespartinê dide ber me, ma ji xweparastinê pê ve tu alternatîfên me dimînin? Niha hedefa


me ya pêşîn, li hemberî tevgerên îmhakirinê, yên ku diyar e dê zivistanê jî bêwestan û rawestan bidomin, berxwedan û têkbirina wan e.

Wekî tê zanîn dema dor li pisîkekê jî were tengkirin, wê bi pencên xwe li ber xwe bide. Lê ez dixwazim di warê siyasî de rola xwe bi cih bînim. Li şûna şideta ku ne çare ye, bi zimanê politîk doza xwe bibim serî. Dawiyê hukum, a hikûmeta xwedî prensîp û raya giştî ye. Divê em rastiyan bi her awayî ji hev re bibêjin. Divê em jî ber sedemên cur bi cur rê nedin ku aliyên şer xwe jî rastiye bidin alî. Ji ber ku mesele bi avêtina pêş naçe serî.

Dewleta tirk piştî ku hûn ji Rojhilata Navîn derketin, dibêje: PKK bê rêber ma û belala wela bû.” Hûn li ser vê çi dibêjin?

⇒ Ne hewce ye ez fermanên leşkerî û stratejîk bidim. Diyar e ku ez di gorê de jî bim, dê gel jixweber piştgiriya min bike û dilsoziya xwe nîşan bide. Rûdanên vê dawiyê vê yekê nîşan didin. Mesele ew e ku ez vê dozê bi awayekî demokratîk û aştiyêke bi rûmet bibim serî. Dema ku ev dilsozî û girêdan bi vî awayî were bikaranîn, ji bo hemî derdor û aliyên eleqedar firsendek e. Cudabûn û parçebûn dê meseleyê xedartir bike. Kurd, ev cara pêşîn e ku yekîtiya xwe pêk tînin. Ev pêşveçûneke dîrokî ye. Lewre divê sistema fermandarî û otorîteyê di vê çarçoveyê de were dîtin. Ev dê bêhtir li rastiya kurdan were.

Ö.P: Romayê kêşeya kurd bi koçberiya penaberên kurd nas kir. Hûn li ser koça kurdan a bo Ewropayê û çareseriyaya wê çi difikirin?



⇒ Bêguman sedema sereke ya vê koçberiyê şerê taybet e. Lewma armanca dewleta tirk valakirina Kurdistanê ye. Bi baweriya min ev yek bi sedemên aborî tê bincilkirin. Lê ji ber ku bi armancên siyasî Kurdistan tê valakirin, ev kes wekî penaberên siyasî tînen hesabandin.

Ger di vî warî de em digel ewrûpayîyan bixebitin, em dê rê li ber gelek şasiyan bigirin. Gelê ku piştgiriya me dike, bi karên ne meşrû ranabe. Her wiha heke xwedî naverokeke siyasî be, dê li gorî rêz û rêçikên wê tevbigere. Divê li ser vê bingehê statûyêke bê danîn. Nexwe dê bi armancên aborî û malbatî bi rê bikevin û dê koçberî were îstismar kirin. Ji ber vê yekê ger ev gel aliyekî şer be an divê statûyêke siyasî bê dayin an jî divê penaberîya wan neyê qebûl kirin. Dema wisa be, ne Tirkiye diwêre Kurdistanê vala bike ne jî kesên penaber wê bikaribin bi hêsanî li gorî berjewendiyên xwe peryan qezenc bikin.

Dema li tevahiya Ewropayê bi vî çavî li meseleyê were nihêrtin, dê mesele bi giranî çareser bibe. Diyar e dema mirov giraniya xwe bide ser çareserîya siyasî, dê meseleya koçberiyê jixweber çareser bibe.

Ö.P: Gelê Kurdistanê bi her awayî piştgiriya xwe bo we pêşkeş kir. Gelo ji bo gelê kurd mesaja we çi ye?

⇒ Di vê pêvajoyê de me her tim bo gelê xwe mesaj ragihandin û em dê ragihînin. Di serî de ji bo kesên ku xwe şewitandine, jinên ku ketine greva birçîbûnê, xwepêşandêrên Romayê, ji bo tevahiya gelê me ku rabûye ser piyan û dostên me rêz û spasdariya xwe pêşkeş dikim. Dîsa li ser bingeha soza serketinê, dilsozî û girêdana xwe dubare dikim û rêz û silavên xwe bo wan radigihînim.

ALİ ÖZŞERİK
(Ö.POLİTİKA/ROMA)

Helbestine ji girtîgehê:

Şev tarî ye tarî avis e

Şev

Şev derya ye
Pêlên tariyê serhev wer dibin
Mîna pîrhevoka
Bi nevpîrçeka
Bi rûyê heyvê ketin
Li ser dêmên heyvê
Cihokê xwînê herikîn

Stêrk bizdîn
Ser û binê hev ketin
Ji tîrsa çep û rast reviyar
Madê ezmên xerîqî

Çem xemgîn in
Nema li bedena xwe
Dikşînin kirasê şewqê
Xuşe xuşa pêlan bi keder
Nema dibiriqîn

Rûyê axê melûl bû
Rih çilmisîn
Eniya erdê qermîçî
Xuliyê mirinê
Bi ser de barî
Û...

Şev tarî ye
Tarî avis e
Di nava êşa welidandinê de
Diperpîte

Şev bédeng e
Bédengî dayik e
Di dilê xwe de
Hêrsa hesreta awaza evînê
Veşartîye

Şev mirin e
Mirin tov e
Di payizê de
Gupîkê bihara jîyanê zîl didin

Şev xeyal e
"Xeyal jî dibe aramî
jîyanbûna rastiyê ye"

Pîştî!...
Xewnên hezar şevan
li perava asoya tarî ye
Pêlên perê zereqa ROJA Mezopotam-
yayê
Bi rûgeşî
Mizgîn didin cîhanê

MEMED MEMEDÎ

Ez kî me?

Ez im ez!
Di nava dilê bajarekî de derketime
paşîla min de nanê tenûra herî
ji spîndarên beravî
hêviyan belav dikim

Ez im ez!
Zarokekî kurd im
ji Etrûşê ji Ninovaya dîrokî,
ji Helepçeyê me



j i
w a n
mîlyonên
bênaw

Carîna Egît im
carîna kulîlke-
ke stûxwar
û carîna kevokek

şîr spî

Ez im ez!
Ez di kolanê bajarên biyan de derketi-
me
bi derketina min
tawanbariya mirovahiyê xuya dibe
çiqas pêxember hebin
xwe di nava berfê de vedişêrin

ger heye li ser min
agirê dojehê direşînin
ger heye bi dengêkî qure
fermanê dixwînin
ji bo dîlkêşîya min

Ez im ez!
dîlopek ji xwîna we
hêstîrek ji çavê we me
li deverêke dinê
zarokek bigirî
dilê min diperpîte û
asîman tete xwarê

*Ev helbest ji girtîgehê bo me hate
şandin lê helbestvanê wê ne diyar e.
Ger mimkûn e bila helbestvan me a-
gahdar bike.

Xo rasanê

Nere wayenê birayenê

Sîma ça hên vinetê
Apo, xalo, deraza wurzê

Govenda govenda newiya
govenda ser serûne

Herme bide jûminî
Destê xo çî çiçîpkêrî
Xo rabûne rasûne
Linge verde rasane
Desmalekî rasane

Ala birûska Botan da
Tifong derg derg erjîne
Herd germîno bûxe, xo dane
Ecep naza çik beno

Beno beno tertele beno
Tertele dismun beno

Tîj vejîya ser Botan da
Milet seno wû het de
Dare bero gulîlk kerdo ro
Wele hên bereqîna

Bereqêya bereqîyane
je zernî bereqîna

ISMAÏL BALCA

Dem Dem e

Hoy hoy!...

Dîsa dibore
Dixwazin hêdî hêdî li me bikin tarî
Dîsa dixwazin vekin deriyê dojehê
Girtîgeha goristan û mirinê
Dîsa dixwazin bikin tarî
Dest dane hev li dor me sê hovên har
Sê gurên devbixwîn
Niç niça diranên wan li ser me ye
Êrîş dikin ji çar aliyar
Dane pêş xwe xayin û xwefîroş
Dem giran e li serê me

Dîroka qirêj û gemar
Bi xwefîroşên Bekoyê Ewan
Îdrîsê alîgir û zarokên wî
Qasim û Rêberê rûgemar
Û tev qirêjîya Barzanê erzan

Dem dem!...
Tê ku de here
Vê carê
Nema ew forsa te ya berê
Ew çî raman e, ew çî saz û pêlan e?
Li aliyê din
Dîsa hatin leheng
KAWA, Mazlum, Zîlan, Sema, Oral û
Aydın
Tev dibêjin:

"Hûn nikarin Roj'a me tarî bikin!"

Roj nabe tarî, Roj nabe tarî
Em bi sond û peyman in
Ji Îbrahîm Xelîl û Îsmail bêhtir
Bi girêdan û bawer in
Cîhana me zelal e

Bi tîrêj û delal e
Ji rengê agirê Kawayê Hemdem e
Mazlum Doğan e

Nabe nabe!...
Roj tarî nabe!
Roj bilind e, bi tîrêj e
Bi tîrêjê reng daye kesk û sor û zer
Cîhanê dixemilîne
Ji bajaran ta çîyan
Li Kurdistanê ji dilê Rojhilata Navîn
Li Asyayê ronî dide
Ewrûpayê û hemû cîhanê

Tîrêja Roj'a nû
Di nav gel de hêz e
Di çavan de ronî ye
Di dilan de rûniştîye
Di mêjî û giyan de
Zelal û zelal e

Ne Ava Zemzem ne jî asîman
Weke Roj'a min ne zelal û ronî ye
Pir şêrîn e bi delal û heval e
Tev cîhan e
Cîhana lehengê pakrewanê Cotmehê
ne
Yek bi yek dibêjin
Rojbaş rojbaş

Tev bi ferman
Va ye roj bilind e
Serê xwe rakin
Çavê xwe vekin, hişyar bin

Hûn tev leşkerê Rojê ne
Bicivin, xwe bidin hev
Roj'a me nabe tarî

Şer şer e!
Bala xwe bide, çavê xwe veke
bibîne Serokê mezin
Em yek in nabin çar di vê cîhanê de
Yek bi yek diqetin zincîrên hovên har
Ho ho!....

Xayinên xwefîroş
Gurên devbixwîn
Dilerizin, ditirsîn ji tîrêjê şewqa tavê

Dem dem e!
Pir biha ye
Zêrîn e, şêrîn e, bihara rengîn e
Çîçeka bi bîn e
Jiyana gelê Medî ne
Tu kes nikare ji me bistîne
Va ye em tev li ser piyan vejîne
Doza me tev bi xwîn e
Riya me gav bi gav pêtê agir dixemilî-
ne
Xemla wê
Xemla Rojhilata Navîn e
Were tu jî bibîne
Qelenê wê jî xwîn e
Jiyana azad û şêrîn e

● Programa Navenda Çanda Mezopotamya ya Stenbolê
29 sarmawez 98, yekşem:
Bîranîna Seyîd Rîza
Muzîk, Semah, Şîr, Dia.
Cih: Küçükçekmece HADEP. Saet:15.00

● NÇM İzmir
29.11.98, yekşem:
Konsera Dengê Bahozê "Şitlek ji Welêt". saet:17.00

ÇALAKIYÊN HEFTEYÎ



● Navenda Çanda Tohum

29.11.98, yekşem: Panel-Dî erdnîgariya me de DGM û rastiya girtîgehan.
Beşdar: Av.Gülseren Yolerî-IHD, Av. Murat Çek-ÇHD,
Buroya Atılım Hıçûç

● Navenda Çanda Tohum, saet:15.00

30.11.98, duşem: Fîlme 'Dema Mirtiban', saet:19.00

● YÇKM

29.11.98, yekşem: Bi zimanê huner mirov û civak-Wê çalakiyên meha ser-
mawezê bêne nîqaşkirin, saet:14.00

Li dijî şideta zayendî, Pêşangeha wêneyan



Pêşangeh bi giştî ji portreyên maxdûr û serhildanên jinan pêk tê. Her wiha tenê şahadeta li Kurdistan û Tirkîyeyê bûye mijar.

25'ê sarmawezê 38. salvegera "Roja Têkoşin û Yekbûyîna Li Dijî Şideta Zayendî ya Navneteweyî" ye. Li Komara Dominikê, ji Tevgera Lixwevegera Civakî xwişkên hev Mirabelan, li dijî diktatoriya Trujîlo serî hildidin. Herdu xwişkên tînan revandin û piştî ku lê tecawûz tê kirin, tene kuştin. Piştî vê bûyerê jinên Amerîkaya Latîni û Karaipî vê bûyerê protesto dikin û têkoşîna wan a di vê riyê de li dinê belav dibe. Bi vê armancê piştî ku têkoşin navneteweyî dibe, roja 25'ê sarmawezê wekî "Roja Têkoşîna Li Dijî Şideta Zayendî" tê îlan kirin.

Bi vê mebestê bi pêşengiya Yekîtiya Jinên Kedkar û alikariya saziyên wekî Yekîtiya Jinên Azad (ÖKD), Roza, K. Kadav, Jinên KESK'î, Jinên IHD'yî û gelek jinên ji sazî û weşanên din pêşangehek hate lidarxistin. Pêşangeh roja 22'yê sarmawezê li EKB (Yekîtiya Jinên Kedkar)'yê nebû. Her wiha bi vê mebestê heman saziyê daxuyanek da çapemeniyê. Di daxuyaniyê de li ser armanca pêşangehê wiha tê diyarkirin:

"Li erdnîgariya me jî şideta zayendî bi her awayî li jinan tê kirin. Jinên me li malê, li dibistanê, li cihê xebatê, li medyayê bi şideta zayendî re rû bi rû dimînin."

Her wiha daxuyanî balê dikişîne ser şerê

qirêjî, ku ev 15 sal in li Kurdistanê tê meşandin û ev yek wiha tê destnîşankirin: "Şükran Aydın, Remziye Dinç, Asiye Güzel Zeybek, Zeynep Avcı, Serpil Yeşilyurt ji maxdûrên vî şerê qirêjî yê li Kurdistanê tenê çend minak in."

Mijarên portreyan

Di pêşangehê de ne tenê maxdûriya jinan her wiha berxwedan û serhildanên wan jî hatine pêşkêşkirin û portreyên van serhildan û çalakiyên ku hemû ji çapemeniya kurd û tirkînan hatine girtin, bi awayekî fireh cih ji xwe re girtine. Wekî fotografên şer, ên jin û zarokên Helebçe, hindik cih girtibin jî balê dikişînin. Lewma portreyên jinên gerîla ku hatine kuştin û li cesedê wan tecawûz û îşkence hatine kirin, di pêşangehê de cih negirtine.

Di pêşangehê de ji bo Dayikên Şemiyê quncîkek taybet hatiye veqetandin û hovîtiya ku polîsan li wan kiriye, bi awayekî berfireh hatiye nîşandan.

Çarçoveya pêşangehê ji aliyê serdestiya navneteweyî ya li ser jinê teng maye. Lewma wêneyên pêşangehê tenê li ser jinên Kurdistan û Tirkîyeyê ne. Pêşangeh heta 29'ê sarmawezê wê ji gel re vekirî be.

EVİN RONÎ /STENBOL

TÎŞK

Roma paytextî kurdan e



BEKİR ŞIWANÎ

Rojnamekanî Îtalya herwa le xowe nebû ke çend rojêk le ser yek deyanûsî; Roma Paytextî Kurdan e, çünke wêstgey şemanefer û firokexanekan û rêga û otobanekanî Îtalya cimeyan dehat le kurd.

Ew rojey le televîzyon pêwitra xom ko bikemewe û bigeme Roma, ke çûme firokexaney Bruksel û siwarî firoke bûm û çawêkim gêra, temaşam kird 30 ta 40 kurd be heman firoke berew Roma deçin. Kesekan le çine coraucorakan bûn, perlemantar û nûser, roşinbîr û kasikar, pîr û law û jin û piyaw. Belam mebest yek bû: Rageyandinî piştigirî bo Serokî Giştî Partî Kirêkarî Kurdistan Abdullah Öcalan ke rojêk ber le çûnî ême geştibuwe Roma. Rageyandinî piştigirî bo Öcalan, le ser binaxey ew bawerey ke be resmî nasînî nasnamey siyasî ew, be watay dest pê kirdinî qonaxêki niwê ye le kêşey kurd da. Ke geştîme naw cemawer le Meydanî Celio, bînim kurdî hemû parçekan bo nîşandanî piştigirî û helwêst niwandin rûyan le şarî Roma kirdiwe.

Hemû dilekan le hemû lawe bo yek mebest lêyan dabû boye le Roma kobûnewe. Ew Romayey ke le maweyekî zor kurt da serincî hemû roleanî gelî kurdî bo ser xoy rakêşa. Carî yekem kurd be kirdewe û awa be hêz le naxî xoyan da sinûrekan desimewe û rû le a-soy geşî yekêti neteweyî dekan. Herçim bîni û legel herkes qisem kurd, hemû her yek amanc û yek daxwaziyan hebû: Ewan le nasînî nasnamey siyasî Öcalan da hîway paşeroj debînin û pêyan waye ke lew rêyewe kêşey kurd be giranî deçete ray giştî cihan û komelgay nêwdewletiyewe û êdî kêşeke xo-desepênê û cihan û naçar debê çareserêki bo bidozêtewe. Birway behêzî Kurdistanîyekan be têkoşîna rewayan le pênanî bedest hênanî mafê rewakanyan da, palî pêwanan yek hefte, roj û şewe û be bîrsêti û le berserma le ser zemînî req û teqî gorepanî Celio beser berin.

Kurdekan rêbazêki zor dîmokratîyaneyan girteber le niwandinî çalakî da û emeş karêki way kird serincî ray giştî Îtalya bo ser xoyan rakêşin û rêz û pêzanîni hemû cihan be dest bînin. Dekrê bilêyn bayex pêdanî bêwêney dezgakanî rageyandinî cihan be çalakî kurdekan, ew rastiye serewey deselmand. Hemû cihan dezanê ke kurd hemîşe legel şewazî xebatî dîmokratî da buwe û ta naçar nekrabê destî bo çek nebidiwe. Eger riq û pestî û turebûniş le naxî da pengî xwrdbêtewe, ewa kirdiwêti be gir û wekû Zulkif Yılmaz le Meydanî Celio le cestey xoy berdawe û şewezengî tarîk û nutekî rêy geştiyan be azadî pê rûn kirdotewe. Belê hemû dilekan le Roma bûn û ew şare dêriney bêşkey şaristanî û mirovayeti amêzi bo xewn û hîwakani gelî kurd kirdewe. Encam herçonêk debê ba bibê, rastiyekey heye ke gumanî lînakrê ewîş; Girsanewey Serokî Giştî PKK Abdullah Öcalan le Roma, qonaxêki girîng e le meîjûy netewey kurd da û gelhi kurdîş piştapişt yadî ew rûdawe dekenewe.

Hûn nikarin roja me tarî bikin


Gelî hevalan!

Neyar dîsa bi lîstikên qirêj bi ser me de tê. Naxwaze ku em azad bibin. Dixwaze ku em her dem kole bimînin. Dixwaze ku em xizmetkarê wî bin. Dijmin dixwaze ku em xwe înkâr bikin û em bibêjin "em tirk in". Dijmin naxwaze ku em zana û têkoşer bin. Dijmin naxwaze ku em yekîtiya xwe ava bikin. Naxwaze em di biharên rengîn de Newrozên xwe pîroz bikin.

Ji bo vê yekê dijmin dixwaze serê me jê bike. Serok mêjiyê me ye. Dijmin dixwaze Serok bikuje û tune bike. Çima? Lewra serok roja kurda ye. Serok ji bo welatekî baş dixebite. Serok, yekîtiya me çêdike. Serok naxwaze ku zarok jar û belengaz bin. Serok dixwaze zarok bêtirs û bêxof mezin bibin. Serok dixwaze ku em ji welatê xwe hez bikin. Serok riya jiyana me vedike.

Lewra dijminê hov, dixwaze Serokê me bikuje. Lê kurd ji serokê xwe hez dikin. Kurd, serokê xwe diparêzin. Hevalê me yên di zindanan de ne, li serokê me xwedî derketin. Ji bo ku Serokê me biparêzin bîst heb heval di zindanan de xwe şewitandin. Gelê me Serokê xwe diparêze, Serokê me Roja me ye.

Dijmin nikare Roja Me Tarî bike...



Pirs

■ 1. Hevalên me yên gerîla li serê Çiyayê Cûdî ne. Hûn jî li Çiyayê Gabarê ne. Hûn dixwazin harine ba hevalan. Di navbera Cûdî û Gabarê de 10 kilometro heye. Hûn dikarin rojê 2 kilometroyan bimeşin. Ji bo ku hûn hevalan bibînin, pêwîst e hûn çend rojan bimeşin?...

■ 2. Hevalê we di zindana Amedê de girtiye. Hûn jî li Mêrdînê dimînin. Di navbera Mêrdîn û Amedê de 70 kilometro heye. Ereba ku hûn tê de ne, di saetê de 10 kilometro rê diçe. Gelo hûnê di çend saetan de bigihêjin Amedê?

(Jindar Demhat)

LORÎKÊN ZAROKAN

Xwezî bibûya zivistan
Lawikan li tenbûran xista
Keçikan dolab birista

Ew kî ye kî ye
Ew lawikê kê ye
Bi kiras û derpî ye
Xweda xweda mal ava
Ji xelkê bûk ji me zava

Qurban qurban ji ku tê
Hespê wî dike pikûtê
Mêvan e ji mala xaltê

Dayê qurban vî derî
Mirtib hatin ber derî
Def kirine şeş kerî
Xatûn gešta me werî

Her bijî her bijî
Carek di jî bijî
Xwedê bide emr û jî
Bi dê û bav bijî
Xêr bijî xêr bijî
Xêrxwazan malik tijî
Xêrnexwazan çavik birjî

Xêrnexwaz in ew neyar in
Ew qirêj û bi gemar in
Dexs in ew çavnebar in
Ji mirovatî ew bêpar in

AMADEKAR
GIRTÎGEHA ÛMRANIYÊ

Hejmara taybet a Jiyana Rewşen

Nivîsarên girtîgehan

Rojname û kovar divê her gav birêk û pêk, û her gav di heman saetê de derkevin pêşberî xwendevanên xwe. Ger bi rêk û pêk dernekevin xwendevan jê sar dibin. Kovara Jiyana Rewşen her meh bi rêk û pêk derdikeve lê her meh dereng digihêje ber destê xwendevanên xwe. Kovara Jiyana Rewşen jî divê wekî her kovar û rojnameyên din bi rêk û pêk, her meh di yekemîn hefteyê mehê de derkeve pêşberî xwendevanên xwe.

Di meha sermawezê de Kovara Jiyana Rewşen kevneşopîya xwe ya ku par dabû destpêkirin îsal jî domand. Di vê mehê de bi hejmara xwe ya taybet ku bi nivîsên dilên şerên ku li girtîgehên Kurdistanê û Tirkiyeyê dijîn derket pêşberî xwendevanên xwe. Ev hejmara Jiyana Rewşen duymîn hejmara wan a taybet e.

Di vê hejmarê de nivîseke M. Can Yüce ku ji aliyê Cemil Denli ve hatiye wergerandin a bi sernavê "Şoreşa Kewçêrê kete 79 saliya xwe" bala mirov dikişîne. M. Can Yüce di paragrafê de wihâ nivîsandiye: "Erê, Sosyalizma Reel mir, celeb û nîrekî Sosyalizmê qediya. Lê Şoreşa Kewçêrê dijî. Di salvegera xwe ya 79'an de, Şoreşa Kewçêrê hîn jî dilê me xweş dike, kêf û eş-


qa me ya şoreşgerî geş dike."

Di rûpelên dinê de nivîsa Murat Kaya ku berî xweşewitandinê nivîsanidibû "Agirê wan azadiya ma ye", Ehmed Huseyn "Gihayê jiyane homa agirê newrozê ye", Osman Akdağ "Me di agir de xwe afirand" û Dilûcan Şêr jî "Pêvajoyên Şoreşî û Serokatî" nivîsandiye. Di vê nivîsê de Dilûcan Şêr rewşa Serokatîyê û gel wiha bi lêv dike: "Serokatî; gel û hêzên gel li hev kom dike, rê şanî wan dide. Tevgera bêserokatî mîna keriyekî bêşivan e."

Her wiha di kovarê de helbest, bîranîn, çîrok û di dawiyê de jî xaçepirs û çalakîyên di vê mehê de çêbûne, cih digirin. Çîroka Harbi Soylu "Xezal" (di pêşbazîya çîrokan a ku NÇM'ê, Beşa Sinemayê li dar xistibû de, xelata yekemîn wergirt), çîroka Talip Kalın "Asê" (di heman pêşbazîyê de xelata sêyemîn wergirt) û çîroka Fatma Savcı "Sêvek ji dara civatê" balê dikişînin.

Helbestên ku di vê hejmarê de cih digirin jî balkêş in. Wekî helbesta Mehmed Mehmedî "Kes nikare Roja me tarî bike" û yên din.

SERWÎSA ÇANDÊ



Bi Kurdî cihana hejmaran

Ev çar sal in Înstîtuya Kurdî ji bo Lêkolîn û Zanist li paytextê Almaniyayê li Berlînê karên xwe yê çandî û zanistî dimeşîne. Înstîtuyê, heta îro gelek xebat pêk anin û berhem weşandin.

Yek ji van xebatan jî, ji bo perwerdekirina şagirtên kurd bû. Înstîtuya Kurdî bi awayekî zanistî ev xebat meşand. Pirtûka mamosteyê kurd Îzedîn Nasso ya bi navê "Matematîk -1, Cihana Jimarên, ji bo Pola Yekemîn" ji aliyê Înstîtuya Kurdî ve ji bo Lêkolîn û Zanistî hat weşandin.

Matematîkê bi kurdî fêr bibin


Pirtûk bi taybetî ji bo şagirtên kurd, yê dibistanên Ewropa û penaberên Maxrumên ku dixwînin û ji bo hemû dibistanên kurdî hatiye amade kirin. Temamê pirtûkê 67 rûpel e û ji bo ku zarokên kurd, hejmarên matematîk baş fêr bibin, di pirtûkê de gelek wêne û grafîk hatine bi kar anin.

Zimanzanê kurd Nasso pirtûka xwe ji van sê mijaran amade kirîye: Ji tiştên nasdar derbasî tiştên nenas, ji tiştên hêsan, derbasî tiştên dijwar, ji tiştên diyar derbasî tiştên nediyar dibê. Li aliyê din di pirtûkê de têgînên nû jî hatine bikaranîn. Wekî mînak; tevûn (toplama), derbûn (çikartma), carbûn (çarpma), parbûn (bölme). Pirtûk bi awayekî wisa hatiye amadekirin ku şagirt her tim di nava liv û lebadekê de bin û bi fêrbûna têgînên matematîkê re zimanzanê kurdî jî, fêr bibin.

Nasso li ser pirtûka xwe ditînen xwe wiha fîne zimên: "Ji bo amadekirina vê pirtûka Matematîk -1, Cihana jimarên, ji bo pola yekemîn bi vî şewazî, xebateke demdirêj û bi tesîr pêwîst bû."


Nasso û Înstîtuya Kurdî, xebatên wisa wê di demên pêş de bidomîwnin.

PERWER BENGÎ



Rojev

OSMAN ÖZÇELİK



Rojev; Abdullah Öcalan, PKK, kurd û Kurdistan e. Ne tenê, li Tirkiyeyê û li Kurdistanê; ne tenê li Îtalya û Ewropa. Kêşeya kurd li hemû cihanê bûye rojeva yekemîn.

Di dîroka kurdan de bi qasî îro tu carî kurd neketine rojevê. Di dawîya sedsala bîsttan de careke din jî hat fêmkirin ku her çîqas bêyî hêza çekdar nebe jî, hêza têkoşîna demokratîk pirtir balê dikişîne. Bi xwezayî di rêya çareserkirina pirsgerêkên politîk de, bi tesîrbûna dîplomasiyê ne îro derketiye holê. Belê pêşveçûna teknolojiyê ragihandinên dinyayê piçûk kirine. Telefon, Fax, Înternet. Bi ya min bandora van her sê sisteman ji ya çekên biyolojîk û Nukleerê jî zêdetir e. Û çeka herî mezin jî televîzyon e.

Xizmeta ku MED-TV'yê di van çend rojên dawîn de kir, ne tene gotin û ne jî tene tarîf kirin.

Di rojname û televîzyonên tirkan de ax û wax e. Dibêjin: "Em di warê leşkerî de bi ser ketin. Belê, me di dîplomasiyê de hunda kir." Dibêjin: "Kurd li hemû cihanê belav bûne û alemê dixapînin. Kurd bi her zimanî dizanin û didin bawer kirin ku ew li Tirkiyeyê bê mafînin." Rojnamevanên tirk ên ku beşdarî bernameya Pînokyo ya televîzyonê italî bûbûn ji hêrsa hêç bûbûn. Şîrovekarên, bername şîrove dikirin: Berdevkên kurdan "Şaqir- Şaqir" bi îtalî diaxivîn. Lê yê wan? Tu kesî ji wan bi îtalî nedizanî.

Ji Parîsê Seydo telefon kir. Got: Li vir, bi navê l'equipe kovarek sporê heye ku xwendevanên wê tenê l'equipe dixwînin. Û xwendevanên vê kovarê jî politîkayê qet hez nakin. Bi saya serê maça CS û Juventus ê ew jî bi kêşeya kurd hesiyane û pirtirên wan bûne dostên kurd. Dostekî din jî got, bi derketina Serokê PKK'ê re hemû kurd bûne yek. Kurdên ne dilxwaziyên PKK'ê bûn jî li hember êrîşên dewletê yê hovane, bûne yek.

Papa Jean Paulê duym gatiye em her gav bi gelên bindest re ne. Serokwezîrê Fransa Jacques Chirac gatiye em wek Fransa li cem Îtalyayê ne, Îtalya li gor qanûnên xwe dimeşe û qanûnên Îtalya demokratîk in. Wezîrê Karê

Derve yê Yewnenîstanê jî gatiye divê ev pirsgerêk li gor hiqûqa navneteweyî bi riyeke aştiyane çaraser bibê.

Heta îro Almanya tu piştgiriya Tirkiyê nekirîye. Yekîtiya ewropa, rexne li ambargoya aborî a ku Tirkiyê li hemberî Îtalya dimeşîne kirîye û bala Tirkiyeyê kişandiye.

Piştî ku Tirkiyê di qada navneteweyî de bi tenê ma, ji bo gelê xwe yê demoralîze bûye, bide sekinandin şerbetê nijadperestiyê pê dide vexwarin. Êrîşek mezin dan ser avahiyan HA-DEPê. Serokê Giştî birêz Bozlak girtin. 138 rêveberên Partiyê hatin hepskirin. Grevên birçibûnê belav kirin. Di bin kontrola hêzên ewlekariyê de, hêzên piçûk ên nijadperest, çalakvanên greva birçibûnê ricimandin. Jê hezar kesan pirtir mirov hatin binçavkirin. Partiyên din di meclîsê de bûn yek û bi hev dî re ketin pêşbazîya dijîtiya kurdan. Rojname û televîzyon, ji wa kêman neman.

Şewirmendê dewletê, xwepêşandanên neteweperest rexne dikin. Dibêjin em bi van xwepêşandanên dikevin tengasiyê. Êdî hewl didin ku bi destê cerdevan û tîmên taybet li bajarên kurdan xwepêşandanên li dijî Îtalya û PKK'ê li dar bixin.

Xwedê mirovan nexe tengasiyê.

Mezin Eşek

Sakir, şagirtê dibistana seretayî bû. Şeş-heft salên wî bû ku diçû dibistanê, lê belê hê diçû pola sêyemîn.


Rojekê ew û bavê wî diçin karê rez. Bavê wî kesaxê dîke û ew jî şivan berhev dîke û dibe derveyê rez dîke kom. Wexta firavîne tê, herdû rûdinin nanê xwe dixwin û pey re bêhna xwe vedidin. Bavê wî dibêje:

– Şakir, lawo ev ew qas salin ku tu diçû dibistanê, gelo tu hînî tirkî bûyî an na?

- Erê, ez navê her tiştan dizanim.
- Bavê wî dipirse:
- Navê rez çi ye?
- Rezîk.
- Navê mêwê?
- Mêwik.
- Navê şivê çi ye?
- Şivistok.
- Navê tirî?
- Tiryok.
- Navê merê?
- Merîn.
- Navê axê?
- Axîn.
- Bavê wî radibe, hêrs dibe û dibêje:

– Lawê min! Ma ku tirkî ev be, ez jî dikarim bi tirkî biaxivim.

– Ma te navê tiştên hêsan pirsîn, lewma tu dizanî. Tiştên zehmet bipirse. Bavê wî dibêje: “De hema ka bibêje;



navê kerê çi ye?” Şakir xwe qure dîke û bi dengê bilind dibêje: “Êşek e û navê hespê jî mezin eşek e ha.”

Ez ne qaçincî sinifim

Salo, ji dibistanê dihat. Pirtûk û lënûskên wî di bin çengê wî de bûn.

Gava ku di ber civata zilaman re dibas bû, bala zilamekî kişand û zilaman bang lê kir:

– Salo, te hê dibistan kuta nekiriye? Ma lawo min diye nediye tu diçû dibistanê. Tu diçû qaçincî sinifî? Salo bi xeyd bersiv da û got:

– Ez ne qaçincî sinif im! Elikê we qaçincî sinife. Te fêhm kir!

BERHEVKAR: ADAR JIYAN

Bagerê ez avêtim

Rojekê zilamek diçe diziya rezê gundiyan. Gundî zilêm di nava rez de dibînin û jê dipirsin:

- Tu çi dikî?
- Ez tiştêkî nakim lê bagerê ez avêtim nav rez!
- Ê ma te destê xwe avêtiye tirî?
- Min destê xwe avêtiye ji bo ku bager min nebe!
- Ma ji bo çi te tirî kiriyê tûrê xwe?
- Ez jî li vê mame heyirî gelo çawa kete tûrê min.

ÛBEYD ÇEVİK

BI XELAT... XAÇEPIRSA BI XELAT (148) XAÇEPIRSA

Şehidek (wêne)	Babirek, yelken	Gihaneke	Qirêj, qiler	Navekî mêran	Li cihê berz, raste berepaşki
Sûc	Cinavkek	Jiyana nû	Tipek	Menteşe	
			Pere		
			Tîpa dawîn		
Bekemasi, tam			Bajarekî Kurdistanê		
Cinavkek			Tîpa dû q'ye		
	Bi kirdki yek Berepaşki Radon		Rêber Xwarina bingehin		
Navekî jinan			Dengdarê n tad'e		Sembola kukurdê
Bi tirkî vege			Bi kirdki 'derxist'		
		İsim		h'were pêsi, dibe sewalek Çamûr	
		Sewalek			
Tîpa dawîn	Tîpa pêncan	Hejmarek			
Grip, arsim	Emeg	Beg û emir			
			Cetwelek		
			Ne kevin		
Navekî jinan					
Tipeke kurdi				Tîpa dû m'ye	
	Psikolojik				

Bersiva Xaçepirsa 146'an

Xaçepirsa me bi xelat e. Di 15 rojan de çi bersiv bigihêjin destê me, em de wan binixînin û bi rîya pişkê li 5 kesan belav bikin. Xelata hejmarê me ya 148'an Pirtûka weşanxaneyê Aram 'Liceli Delikanli' ye.

Jêrenot:
 Ji bo ku bersiva we bê nixandî, divê hûn "Peyva Veşarî" di nava qutiyên li bin xaçepirsê de binivîsin û tevî navnîşana xwe jî me re bişînin.

Pênc kesên ku xelata 146'an Kasetê Mehmet Şexo 'ay lê gulê' kezeç kirine ev in: Dilan Selçuk/ İskenderun, Osman Duman/ Stenbol, Mustafa Soydan/ Riha, İdris Kadremir/ Stenbol, Süleyman Açıy/Midyad

PEYVA VEŞARÎ



Derheqê Kirmanckî de Kombiyayîşê Pancine II

4) "Ke" û virgul

Tayê kesî cumle miyan de çekuyê "ke" ra ver yan zî pey virgul ronani. Meylê kombiyayîşî gore no virgul nêroniyêno.

Nimûne:

Meylê kombiyayîşî.....Nuştîşê bînî
Ez ameya ke ti zî bêrî.....Ez ameya ke, ti zî bêrî./Ez ameya, ke ti zî bêrî.

5) Nuştîşê notanê bibliyografikan

Notê bibliyografikî heme welatan de eynî nênusiyênî. No xusus de standardê îya- cîyayî estê. Kombiyayîşî munaşîb d'ke notanê bibliyografikan de bi rêz (bi sira) nê malumatî bibî.

Nameyê peyen ê nuştîxî (yazarın soyadı), naeyê nuştîxî, nameyê kitabî, nameyê weşanxana (yayinevinin adı), nameyê şaristanî yo ke weşanxane tede yo (yayinevinin bulunduğu şehrin adı), serre, rîpel Mîyanê nê malumatın hemîni de virgul esto.

Nimûne:

Çem, Münzûr, Hotay serra Usifê-Qurzkizî, Weşanên Roja Nû, Stockholm, 1992, r. 124

Eke herunda kitabî de meqale bibo, wina nusiyêno:

Nameyê peyen ê nuştîxî (yazarın soyadı), nameyê nuştîxî, "nameyê meqala", nameyê rojnameyî yan zî kovare (gazete veya derginin adı), hûmara rojnameyî yan zî kovare (gazete veya derginin sayısı), tarîxê rojnameyî yan zî kovare, nameyê şaristanî yo ke rojname yan zî kovare tade neşr biyê (gazete veya derginin yayımlandığı şehrin adı), rîpel.

Mîyanê nê malumatın hemîni de virgul esto û nameyê meqala bi xo îşaratanê" (bi tirkî "turnak işareti") mîyan de yo.

Nimûne:

Haydar Diljen, "Programandê Partiyandê Kurdistan de Persa Ziwanî", Vate: kovara kulturî, nr. 4, Wisar 1998, Stockholm, r. 19

6) Karî ra (Fîlî ra)

a) Suffiksê mesderî: -ene

Tayê kesî gama ke mesderê karî (fîlî) nusênî herunda suffiksê "-ene" de nê suffiksın ra yewî nusênî: êne, eni, -ine, -in. Meylê kombiyayîşî gore "-ene" nusiyêno.

Nimûne:

meylê kombiyayîşî..... formê bînî..... tirkî
-ene.....êne, -eni, -ine, -en, -in
bîyayene, bîyene.....bîyayêne, bîyayîne,
bîyayine.....olmak

dayene.....dayêne.....vermek

şiyayene.....şiyayêne.....gitmek

zanayene.....zanayêne.....bilmek

b) Karê bîyayene (fîlê bîyayîşî)

Tayê cayan de gama ke karê bîyayîşî ancîyêno, herfa B vurîyêna (bedelîyêna) bena V labelê tanî cayan de na herfe nêvurîyêna û sey eslê xo B manena. Meylê kombiyayîşî formê B'yine ser o yo.

Nimûne:

meylê kombiyayîşî..... formê bînî..... tirkî

O bibî..... O bîvî./ O bîv..... O olmuştı.

Her di bibî şehîd.....Hur di bîvî şehîd...İkisi şehîd olmuştı.

Di cayan ra dirbetin bibî..Di cayan ra dirvetin bîvî..İki

yerden yaralanmıştı.

Mi morekî kerdîbî la ra...Mi morekî kerdîvî la ra...Boncukları ipe takmıştım.

Lajekî qeyd bibî.....Lazekî qeyd bivî.....Oğlanlar kayd edilmişlerdi.

Şima xapîfîbî..... Şima xapîfîvî... Sizi kandırılmışlardı.

Kênekî şîşî..... Çênekê şîvî..... Kızlar gitmişlerdi.

O amebî..... O amevî..... O gelmişti.

Mi vatbî..... Mi vativ..... Ben demiştim.

c) "-îme" yan zî "-yîme"

Şiweya Dêrsimî de kesê yewîne karî (fîlî), demo vîyarteyo dîyar (dili geçmiş zaman) de bi "-îme" yan zî "-yîme" (-y+îme) qedîno.

Nimûne:

şîweya Dêrsimî.....şîweyê bînî..... tirkî

ma ameyîme.....ma amey..... biz geldik.

ma bîme.....ma bîy..... biz olduk.

ma kewtîme..... ma kewtî/ma kewtê... biz düştük.

ma şîme..... ma şîy..... biz gittik.

ma vînetîme..... ma vînetî/ma vînetê... biz durduk.

Xortan ma ardîme.....Xortan ma ardî/ma ardê..Gençler bizi getirdi.

Xortan ma fistîme ra xo ver...Xortan ma vîstî/eştê xo ver...Gençler bizi önlerine kattılar.

7) Termê gramerî

tirkîkirmankî (zazakî)

ad.....nâme (n)

ad cümlesicumleya nameyî (m)

ad tamlamasıîzafeya nameyî (m)

adılzemîr (n)

alfabealfabe (m)

artedatpeydat (n)

artikelartîkel (n)

asal sayılarhûmarnameyê bîngeyî

bağlaçbestox (n)

basit cümlecumleya sade (m)

basit fiilçekuyo sade (n)

basit sözcükçekuyo sade (n)

basit sıfatsifeto sade (n)

belgisiz sıfatsifeto nedîyarî (n)

belgisiz zamirzemîrê nedîyarî (n)

belirtidîyar,-e

belirtili isim tamlaması.îzafeya nameyî ya dîyare

belirtisiznedîyar,-e

belirtisiz isim tamlaması. îzafeya nameyî ya nedîyare

belirtme sıfatısifetê dîyarkerdene (n)

bileşik cümlecumleya pêrabeste (n)

bileşik fiilkaro pêrabeste (n)

bileşik kelimeçekuyo pêrabeste (n)

bileşik sıfatsifeto pêrabeste (n)

bileşik sözcükçekuyo pêrabeste (n)

bükümlüante (n),antîye (m)

bükümlü ad (isim)nameyo ante (n)

bükümlü dişil isimnamayo anteyo makî (n)

*Heftayo bîn biyayanên peyînan ser, ma nêşa ca bidê peyniya kombiyayîne didiyîn. Mayê no hefte cayo ke mendbî ra dewam keme.

(DEWAMÊ CI ESTO)

Kerdenanê xo Mahkemaya Ewropa ra biwazê

Îtalya şiyayîne Serokê PKK Abdullah Öcalanî ser, serdarane dewleta Tirk û nûstoxanê ci, jû kemiyina xo tesbît kerda û iyê çend rojiyo na kemiyina xo, anê zîwan û qîrayina qehriyene xo ra û vanê: "Mayê nêzam xo rind bidim silas-nayin. Endamê PKK'yê xo rind danê silasnayin. Coka destegê şaran û dewletanê Ewropa genê".

Bi rastî wexto ke kes nê fikran eşneno, wiyateyê kesî yeno. Eke kes mezano, vano dewleta tirk a tevayê rindî kena (virazene), feqet şar û dewletê Ewropa yê korîn kenê û kerdenanê Tirkîye nêvînenê. Zey ma pêrin nûstox û serdarê dewletê ke, nê fikr û vînanan anê zîwan, rind zanê ke şar û dewletê Ewropa kerdenanê (karanê) rindan jî, aran jî, nezdî ra teqîp kenê. Feqet şar û dewletê Ewropa zey ma hetanî nika qe jew karê şimayê do rind nêdî.

Şima 15 seranê peyînan de nezdîyê çehar hezarî dewî veşnay, xortê kurdan kiştî, meyitê ci eştî (çek-erdî) kutikan ver. Zincan û goşanê kurdan ra tîzbey viraştî, cenîyanê kurdan rê tecawuz kerd, kurdo ke ci rê îşkence nêvirazyay nêmend. Hemû rayê barbarîninê xo şarê kurd û bi taybetî jî xortanê ci ser ro cerîbnay, mebûsê ci çekerdî hepis, partîyê ke kurdan xo tede ifade kerd racenay. Rojnameger, roşnikar û nûstoxê ci kiştî, rojnameyê ci bombey kerdî. Kurdo ke vengê xo vet û haqê xo geyra, hema çebîya hepis. Yanê hemû rayê siyasî û demokratîkî racenay.

Nika jî, şimayê nêşermayena vanê, mayê nêzami xo rind bidim silas-nayin. Şima hetanî nika nameyê însaniya û demokrasiya se kerd ke, şar û dewletanê Ewropa nêdî? Qe qaxû megirê şar û dewletê Ewropa jî, ê dinyayê jî şima rind silasnenê. Çimki şar û dewletê Ewropa îlanan, reklaman û vatenan nêewnenê, ewnenê kerdenan. Kerdenê şimayê jî werte de. Eke ancî şimayê nêvînenê, şima şenê Mahkemaya Haqê Mardimanê Ewropa ra biwazê.

MEMED DREWŞ

WELAT
ROJNAMEYA HEFTEYÎ
(Haftalık Gazete)

■ Xwedî (İmtiyaz Sahibi)
M. NURİ KARAKOYUN

■ Yönetim Yeri:

İstiklal cad. Asmalı Mescit sok. 35/37 No:308

Beyoğlu/İstanbul
TEL: (0 212)
245 16 50 - 251 79 37 - 251 90 13
FAX: 251 95 85

■ Gerinendeyê Giştî yê Weşanê
(Genel Yayın Yönetmeni)
SAMİ TAN
■ Berpîrsê Karên Nivîsaran
(Yazı İşleri Müdürü)
M. SALİH TAŞKESEN

■ ÇAPXANE
Yeni Asya Matbaacılık A.Ş.
■ Yayın Koordinasyon:
Gündem Basın ve Yayıncılık San. Tic. Ltd. Şti.

■ BELAVKIRIN
BİRYAY Dağıtım

■ NÜNERİTİYÊN ME
(Temsilciliklerimiz)
■ Amed:
Tel: 0 (412) 223 34 83

■ Mersin
Tel: 0 (324) 233 83 96

■ İzmir
Tel: 0 (232) 425 37 02

■ Edene
Tel: 0 (322) 351 42 78

■ München:
(Nünerê Giştî yê Ewrûpayê)
Mahmut Gergerli
Tel: 49 871 672 29
Fax: 49 871 670 815

■ Swisre:
İhsan Kurt
Tel-fax
41 21 652 76 07

■ Hollanda:
S. A. Fewzi
Tel-Fax: 31 10 48 555 43

■ Suriye:
Jana Seyda
Helim Yüsvi

Kurdistaniyan li Romayê dîlana yekîtiyê gerand.

Keşe û meleyan bo Serok dua dikirin

Serê meşê li Meydana Veneziayê, dawiya wê li "Meydana Kurdistanê" bû. Gelek kal û ciwanên îtalî tevî vê lehiyê dibûn. Di nav sohbetên meşê de duayên meleyan jî hebûn. Paşê em pê hesiyana ku aşûriyan jî bo ku piştigiriya Papayê Wafîkanê bigirin, bi patrikê xwe yê Lûbnanê re çûne cem wî. Duayên mele û keşeyan jî bo Serok Apo bûn.

JI MEYDANA CELIO ÇAVDÊRIYEK

Bi dehan dil, dilên bi kul û keser, lê bi tîra xwe bi biryar û evîndar re em bi rê dikevin. Piştî çendekê em bilind bûn, me berê xwe da Romayê. Piştî du saetan em gihîştin bajarê Bolognê. Bi trêne em dê xwe bigihînin Romayê. Kurd tev di vagonê de bûn. Bêrivan û Merziye Rezazî bi stranên xwe bala îtalyan dikişînin ser me. Berêvarkî em li Romayê ne. Me berê xwe da Qada Celilo. Belê em gihîştibûn cihê xwe. Em bêtir nêzîkî Serok bûbûn. Êdî bi hezaran dilan bi bi hev re lêdixistin.

Qada Kurdistanê

Li Romayê Qada Celilo wekî "Qada Kurdistanê" hatibû binavkirin. Abdullah Öcalan li nexweşxaneyê hemberî wê mêvan e. Bi hezaran kurd li wir civiyabûn. Ber deriyê nexweşxaneyê bûbû mîna gul û kulîlkên rengîn. Hinek polîsan li wir nobedarî dikir. Herdu deriyên meydana jî aliyê kurdan dihatin kontrolkirin. Hevalên nobedar xêrhatina kesên nûhatî dikin. Piştî kontrolkirina çente û bîrkan dilê wan tevî dilê hezaran dibe. Ber bi êvarê hejmara mirovan digihêje deh hezaran. Meydan tîra me nake. Dengê sloganên me Romayê dihejîne. Bi sedan mirov; mele, nivîskar, rojnameger, bazirgan, kurd, îtalyan, alman, aşûrî, tirk, misilman, fileh, êzîdî, elewî bi hev re dîlanê digerin. Li meydana cihê bo berxwedêrên birçîbûnê hatiye veqetandin. Her roj hejmara wan zêde dibe. Li hemberî nexweşxaneyê nîgargehek hatiye saz kirin. Li ser nîgargehê hunermend bi stran, şano û nûçeyên xwe hestên gel geştir dikin. Xaça Sor ligel hinek sazîyên îtalî çay, qehwe û ava fêkiyan belav dike, konan vedigire.

Şevbaş Serokê me

Êdî nivê şevê bû, dema xewê bû. Belê, beşdar berî ku razên bi dengê bilind mesaja xwe digihandin Serok Apo: "Şevbaş Serokê me!" Rojtira dinê gel bi muzîka Xelîl Xemgîn hişyar dibû.

Ew roj, roja xwepêşandana kurdan û dostên wan bû. Bi sedan mirov jî gelek deverên cihanê diherikîn "Meydana Kur-

distanê". Sae 12.00 bû. Gel bi dostên xwe re dikete rêzê. Her rêzek jî pênc kesan pêk dihat. Paşê em ber bi Parlemantoya Îtalyayê ve meşîyan. Serê meşê li Meydana Veneziayê, dawiya wê li "Meydana Kurdistanê" bû. 5060 hezar kesî bi hev re slogan diqirandin û stran digotin. Trafîk bi yekalî xitimîbû. Gelek kal û ciwanên îtalî tevî vê lehiyê dibûn. Şoreşgerên kevn ên 80 salî ku bûbûn şahidê faşîzma li Îtalyayê, serpêhatiyên xwe bi bîr dianîn. Di nav sohbetên meşê de


lemo ya bi rengê: "Em tu car gef û listikên Tirkiyeyê napejirîn. Radestkirina Öcalan nepêkan e" li ber guhê gel ket, gel rabû ser piyan û sloganên wiha qirand: "Viva Îtalya, libero Kurdistan!" Êdî dema vegeerê bû. Gel careke din berê xwe da "Qada Kurdistanê." Roma bûbû paytexta duyemîn a kurdan. Bala cihanê dikişand ser xwe. Bi dehan rojnameger diçûn û dihatin. Dostên kurdan jî kal, pîr û ciwanên ku li ber sermayê, bêkon ketibûn greya birçîbûnê ecêbmayî diman. Televîzyonên fransî û îtalî, tv û radyoyên welatên din weşanên xwe bi zindî didan.

Li girtîge-

digirtin.

Roja çarşemê, mirov bi bêhneke xwe hişyar dibûn. Belediyeya Romayê meşdan paqij dikir û Xaça Sor jî bo berxwedêran betanî radixistin. Ji bo tendirustiyê doktor ligel ambûlansan hatin piştigiriya çalaksazan. Çapemenî û televîzyonên cihanê li wir zêdetir bûn.

Hêdî hêdî tarî dikete erdê. Romayê kevnar, ku di dîroka xwe de ketibû ber talanan û hatibû şewitandin, vê carê dibû şahidê destaneke nû. Mirovahiya



duayên meleyan jî hebûn. Paşê em pê hesiyana ku aşûriyan jî bo ku piştigiriya Papayê Wafîkanê bigirin, bi patrikê xwe yê Lûbnanê re çûne cem wî. Duayên mele û keşeyan jî bo Serok Apo bûn. Êzîdiyên me yên ku çand û zimanê me, ola me bi sedan sal parastîne jî li Îtalyayê bûn. Îcar bo pîrê me yê mezin, bo Serok Apo di-meşîyan. Li kolana Muzeya Delle Celle xwepêşandan bi dawî bû. Beşdar tev li kolanê rûniştin. Kolanê tîra me nedikir. Rayedarên îtalî, parlementer, endamên Belediyeya Romayê, sendîka û hwd. hatin cihê meşê. Her wiha jî Hereketa Îslamî bigire heta DHP, MLKP, Devrimcîsol, KKP û gelek hêzên din yên ji Rojhilata Navîn û Ewropayê tevî Kurdistaniyan rê girtin.

Wê rojê di parlamentoyê de kêşeya kurd hatibû gengeşîkirin. Piştî ku axaftina Serokwezîrê Îtalyayê Massimo D'A-

han xweşewitandina ciwanên kurd, li gelek deverên cihanê di hate munaqaşekirin.

Viva Îtalya, libero Kurdistan

Kurd her ku diçû bîsebir dibûn. Dixwestin ku biryarek bê dayîn. Protestoyên kurdan ên li ber konsoloxaneyên Almanya û Amerîkayê didomiyên.

Jiyana li Romayê gelek rojan piştî derengiyê şevê dest pê dike. Lewma jî hotel, restorant û dikan her kêlî vekirî ne, trafîk qet ranaweste. Beşek kurdên karker, ku ne di grevê de bûn, diçûn derve ku xwarinê bixwin. Di sîkan de beramberî dimenên ecêb diman. Wêneyên Abdullah Öcalan ku jî rojnameyên îtalî hatibûn jêkirin, ligel nûçeyan li gelek kargehên îtalyan dihatin daliqandin. Wan, bi dilgermî xêrhatina kurdan dikir. Beşek jî restorantan bo xwarinên sivik pere ne-

ku ber bi tariyê ve diçû û li hemberî qir-kirinê li ser kurdan bêdeng mabû, bi sanya kurdên ku agir berî bedenên xwe didan, hêdî hêdî derdiket ber ronahiyê. Belê, Zülküf Yılmaz li Romayê, li "Meydana Kurdistanê" saet di 17.02'yan de agir berdida canê xwe. Dikir qêrîn: "Bijî Serok Apo, Bijî berxwedana gelê Kurdistanê." Piştî vê bûyerê bi banga Serokatiyê re wateyeke nû li çalakiyên wiha hate barkirin: "Bes êgir berdî canê xwe. Êdî dem ew dem e ku em agir berdî canê dijmin." Roja serkeftinê nêzîk e. "Bi derketina Tirkiyeyê em bûn partî, bi derketina Rojhilata Navîn em bûn artêş, bi derketina Ewropayê jî em dê bibin dewlet!" Bi vê beyanê re gel rabû ser nîgan. "Apo hat Romayê Tirkiye ket komayê!"